Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1389 | 28-Pûşper-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Kovara Soryaz; Parêzvana pirrengiya çandî û ramanî

Hêvî Keleş/Qamişlo

**Sernivîskarê Kovara Soryaz Dilşad Murad eşkere kir ku Kovara Soryaz pencereyeke çandî ye ku rastiya civakê vedibêje, çîrok û afirandinên mirovan belge dike, hebûna xwe bi peyameke li ser bingeha gotinên rast û karekî armancdar didomîne.**



Bi hemdemiya hemû rewşên ku di demên dawiyê de li Sûriyê û herêmên Rojavayê Kurdistanê de hatine jiyankirin, helbet bandoreke mezin li hemû aliyên jiyanî yên herêmê kirin. Lê li herêmên Rojavayê Kurdistanê ev rewş hîn bêhtir vegeriya sekneke nû, gavavêtinên nû û têgihştina merheleyê. Aliyên wîjeyî û çandî hê bêhtir rêve çû û berhemên xwe yên nû derxistin. Yek ji van berhemên ku hatine dereketin Kovara Soryaz e ku bi çapa xwe ya yekemîn di Adara 2026"an de derxist. Hejmara yekem ku 100 kopî jê hatin çapkirin, mijarên çandî, wêjeyî û hunerî yên cûrbecûr dihewîne. Di nav wan de lêkolînên li ser dîroka Qamişlo di sedsaliya damezrandina wê de, herwiha beşên birêkûpêk ên ku hevpeyvîn, kesayetiyek taybet, lêkolîn, jin û çand, werger, sînema, çîrokên kurt, helbest, baxçeyek zarokan û Pirtûkxaneya Soryaz firt nava xwe.

Kovar herwiha mijarên têkildarî huner, şano, sînema û govendên gelêrî, ji bilî beşên taybetî yên li ser xweza, erdnîgarî û jinan, vedihewîne. Hejmara yekem hilbijartinek dewlemend ji beşên çandî dihewîne. Di beşa Erebî de, lêkolînên rexneyî yên akademîk derdikevin pêş, wek "Şiriyet Elhezif"ya Firas Haj Mihemed û




analîzek li ser avahiya hunerî di romana "Layla û Franz" ya Dr. Ahmed Hamdino Mihemed. Beşa lêkolînan ronî dide ser nivîskarên ku "kincê spî"hiştine û Wafiq Safwat Muxtar balê dikişîne ser diyardeya "nivîskarên bijîşk" ên ku kincên xwe yên spî bi qelemê guhertine. Ehmed El-Mu'adin xwendinek ji çîrokên Huseyin El Sanuna pêşkêş dike, di heman demê de Atif Ebdel Mecîd romana "Cosmetic Surgery" ya Zeynab Afîfî dinirxîne û Dr. Ayman El-Daker li ser "Glimpses" a Mustafa Elî Ammar dinivîse. Di beşa wergeran de, Mohsen Ebdul Rahman ji bilî helbestek wergerandî ya helbestvan Kazal Îbrahîm Xidir, nivîsên navdar pêşkêş dike.

Beşa folklor û şanoyê lêkolînek li ser destana "Lawkê Xerîb" û strana gelêrî ya Levantînî "Şank Leyla" pêşkêş dike. Di hejmarê de her wiha daxuyaniyên derhênerên şanoyê yên li ser rewşa niha ya şanoyê li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê jî hene. Di kovarê de her wiha çîrok û helbestên nivîskarên navdar ên wekî Mihemed Remezan El Cebûr, Murad Najeh Ezîz û Hemdî Amara jî cih girtin. Beşa "Ramanê Azad" gotarên Raxad Cumaa Xelef ên ku rewşa rojnamegeriya Sûriyeyê rexne dikin û gotarên li ser pirsgirêkên jinan ên Kurdistan Yousef jî dihewîne. Di beşa Kurdî de, hejmar bi lêkolînên rexneyî yên kûr ên li ser romanên nivîskar Halim Yûsef, raporên meydanî yên li ser Enstîtuya Bilind a Hunerê ya Jinan li Hesekê û analîzên dîroka sînemaya Kurdî bi rêya fîlma "Zarî" hate cudakirin. Ji bo hên zêdetir em naveroka Kovara Soryaz her wiha armanc û cudabûna wê nas bikin, Sernivîskarê Kovara Soryaz Dilşad Murad ji Rojnameya me re axivî.

**'Kovara Soryaz sê mehan carekê bi çavkaniyên damezrîneran tê weşandin'**

Dilşad di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser derxistina kovarê û wiha got: "Derxistina kovara Soryaz di nav şert û mercên siyasî û leşkerî yên aloz de bi serê xwe karekî çandî yê bi zanebûn e. Em bawer dikin ku serxwebûna saziyên medyayê ji bo hêz û pêşkeftina wan a pîşeyî bingehîn e û ev yek me motîve kir ku em bi tevahî li ser bingehek dilxwazî tevî zehmetiyên darayî bixebitin. Ezmûnên me yên berê îspat kirine ku nivîsandin li Rojavayê Kurdistanê wêrekî û baweriyekê hewce dike ku pênûs pira me ya ragihandinê ya herî mayînde ye. Fikra projeyê di sala 2025'an de dest pê kir, dema ku tîma damezrîner rêze şêwirdarî bi 38 nivîskar, lêkolîner, pisporên zimannasî û helbestvanên ji Sûriye, Ewropa û çend welatên Ereb re pêk anîn, bi armanca pêşxistina vîzyonek berfireh ji bo kovarê û destnîşankirina nasnameya wê ya çandî û rewşenbîrî. Berî ku kovar bi fermî di 1'ê Cotmeha 2025"an de were ragihandin û derî ji bo wergirtina beşdariyên edebî û çandî were vekirin, damezrînerên kovarê bi rêya name û WhatsAppê bi nivîskar û lêkolîneran re têkilî danîn. Kovara Soryaz sê mehan carekê bi çavkaniyên damezrîneran tê weşandin û hejmara yekem di 15'ê Adara 2026"an de, ku bi demsala biharê re hevdem bû, hate çapkirin."

**'Em bi israr berdewam dikin, bi baweriya ku rastî dê bi ser bikeve'**

Sernivîskarê Kovara Soryaz Dilşad axaftina xwe wiha bi dawî kir û got: "Komîteya edîtoriyê naveroka jimareya duyemîn temam kiriye, ku dê nîqaşeke wêrek li ser "Nasnameya Kurdî li Sûriyeyê, Ji Înkarkirinê Ber Bi Hebûnê Ve", digel beşa duyemîn a raporên me yên li ser sedsaliya Qamişlo, pêşkêş bike. Em bi israr berdewam dikin, bi baweriya ku rastî dê bi ser bikeve. Ji destpêkê ve, me peymaneke exlaqî ava kir ku tundrewiyê di hemî awayên wê de û gotinên nefretê yên li dijî komên civakî û etnîkî red dike. Soryaz, nivîskarên ciwan û jin hembêz dike û em hewl didin ku bibin dengek ji bo her kesekî afirîner, bêyî ku paşxaneya wan çi be. Komîteya şêwirmendiya me ji dehan kesayetiyên navdar pêk tê û em di pêvajoya berfirehkirina wê de ne da ku navdarên wêjeyî ji Başûrê Kurdistana û welatên din jî tê de bin, da ku danûstandinek rastîn a çandan pêş bixin."

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER ŞKESTIN, BINKETIN Û DÛRBÛNA JI ARMANCÊ**

**Bûn dîkilê serşor:**
- Bi heman wateyê.

**Bûn mirîşk:**
- Bi heman wateyê.

**Bûn kewên çîr:**
- Bi heman wateyê.

**Bûn kewên çîz:**
- Bi heman wateyê.

**Di Xana Axpera re derxistin:**
- Zora wî bir û ji wan deveran jî dûr xist.

**Ew li kû mala dawetê li kû:**
- Ji bo kesê ji amanca xwe pir dûr tê gotin.

**Ji behrê xilas bû, di çem de xeniqî:**
- Di karê zehmet de bi ser ket, di yê hêsan de bin ket.

**Ji deveyê ketiye hop hop jê tê:**
- Bin ketiye; gazind bêwate ne.

**Kerrê wan li korê wan xist:**
- Perîşan kirin; tev dan ser hev.

**Kerrên wan li korên wan qulibîn:**
- Perîşan bûn; ji hev ketin; ji hev tert û belav bûn.

**Korên wan di Şamê re derketin:**
- Tev ji hev belav bûn; şkestin; ji hev pelişîn; perîşan bûn; bûn kewên çîr; li dinyayê belav bûn.

**Li heyfa bavê geriya xwîna xwe jî danî ser:**
- Bi ser neket; hat girtin.

**Min tov avêt lê firk hat:**
- Armanca min mezin bû lê bi ser neketim.

**Siwar hatin peya çûn:**
- Bi keyfxweşî hatin lê bi xemgînî çûn; dema hatîn ji xwe bawer bûn, lê şkestin; tişta dixwestin bi destê wan neket.

**Stû lê ba da:**
- Bin xist; şkênand.

**Şaqolê wî şkest**:
- Quretiya wî jê re nema; bi ser neket; keyfa wî şkest; li bin ket.

**Şaqolê wî xwar bû:**
- Bi heman wateyê.

**Xwe da dest:**
- Bi ser neket; hat girtin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Sudoku: Bersiv 80

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 3 | 7 | 5 | 4 | 8 | 9 | 1 | 2 |
| 8 | 5 | 9 | 2 | 7 | 1 | 4 | 3 | 6 |
| 2 | 1 | 4 | 3 | 9 | 6 | 7 | 8 | 5 |
| 1 | 7 | 5 | 4 | 6 | 9 | 8 | 2 | 3 |
| 3 | 9 | 8 | 7 | 5 | 2 | 1 | 6 | 4 |
| 4 | 2 | 6 | 8 | 1 | 3 | 5 | 7 | 9 |
| 5 | 8 | 1 | 6 | 3 | 4 | 2 | 9 | 7 |
| 7 | 6 | 2 | 9 | 8 | 5 | 3 | 4 | 1 |
| 9 | 4 | 3 | 1 | 2 | 7 | 6 | 5 | 8 |

Sudoku:Pirs 81

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 1 | | 9 | | 6 | 4 | |
| 9 | | | | | | | 7 | 3 |
| | | | 2 | | 4 | 1 | | 5 |
| | | | | 1 | | | | |
| | | 7 | 4 | 5 | 6 | | | |
| | | 3 | | 7 | | | | |
| 5 | | 4 | 1 | | 3 | | | |
| 3 | 6 | | | | | | | 2 |
| | 9 | 2 | | 8 | | 7 | | |

## Ji Şerê Cîhanê yê Yekemîn heta yê Sêyemîn: Guhertina stratejî û siyaseta cîhanê

Stratejiyên Şerê Cîhanê yê Yekem, Duyem û niha jî yê Sêyem ji hev cuda dibin. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de, artêşan bi giranî di xendekan de şer dikirin, lê stratejiya Şerê Cîhanê yê Duyem li ser tevgera bilez, êrişên hevbeş û karanîna teknolojiyê sekinî...**R-4**



## 'YRJ; Ji bo jinan xeta parastinê ye'

Endama Meclisa Yekîtiya Raghandina Jin (YRJ) Yara Mihemed diyar kir ku YRJ'ê dengê tevahiya jinan e û wiha got: "Dema em li çapemeniyên din meyze dikin, em dibînin ku weşanên wan têkildarî jinê kêm in an jî terzê biçûkxistinê li beramberî jinê bi kar tînin. YRJ'ê ev zemîn di weşanên xwe de guhert û li şûna wê ked, berxwedanî û rastiya jinê pêşkêş kir."**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1389 | 28-Pûşper-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S



## Têkoşîna Şêx Seîd heta îro jî tê jiyîn

Di 29'ê Hizêrana 1925'an de, Şêx Seîd û 47 hevalên wî ji aliyê dewleta Tirk ve li Qada Deriyê Çiyê ya Amedê hatin bidarvekirin. Tevî derbasbûna 101 salan di ser şehadeta Şêx Seîd û hevalên wî re, têkoşîna ku dabû destpêkirin, heta roja îro jî tê jiyîn.**R-7**



## Zindawerên çand û hunera Kurdî

Helbestvan Emerê Lalê; Bi helbestên xwe bû parêzvanê ziman û nasnameya Kurdî. Tecrûbeya wî ya helbestî bû nîşaneke girîng di rêya helbesta klasîk a Kurdî de û dengê wî hîn jî di hiş û hestên nifşan de deng vedide.**R-9**

# DERENGKETINA ÇARESERIYÊ WÊ LÊÇÛNA HILWEŞÎNÊ GIRANTIR BIKE

Kirîza Sûriyê gihîştiye astek ku êdî nikare înkar an paşxistinê tehemûl bike, her derengketinek di peydakirina çareseriyê de, wê lêçûna hilweşînê hem ji bo civakê û hem jî ji bo dewletê zêde bike. Ji ber wê pêwîst e hikumeta demkî bikeve ferqê ku bêyî demokrasî, nenavendîbûn, edalet û wekheviyê wê tu çareserî neyê peydakirin. Li ser wî esasî jî divê ew bê derengmayîn veguhertinên berfireh û bingehîn bide destpêkirin.**R-6**




## Tirkiyê li ser xaçerêyekê ye: Ketina maskeya rojava û hilweşîna xeyalên dewletneteweyê

Ji destpêka avabûna xwe ve, Komara Tirkiyeyê hewl dide xwe wekî beşeke ji sîstema Ewropayê nîşan bide û maskeya Rojava wekî rêyekê ji bo dûrketina ji rastiya xwe ya erdnîgarî û çandî ya li Rojhilata Navîn bi kar tîne.**R-3**



**Berxwedana jinan li ser şopa YPJ'ê**
Berîtan Xalid R-2



**Siyaseta meşandina kirîzê ya bikontrol!**
Pêjder Altan R-6



**Afirandina wateyê**
Remazan Olçen R-9

# 'YRJ; Ji bo jinan xeta parastinê ye'

Endama Meclîsa Yekîtiya Raghandina Jin (YRJ) Yara Mihemed diyar kir ku YRJ'ê dengê tevahiya jinan e û wiha got: "Dema em li çapemeniyên din meyze dikin, em dibînin ku weşanên wan têkildarî jinê kêm in an jî terzê biçûkxistinê li bermberî jinê bikartînin. YRJ'ê ev zemîn di weşanên xwe de guhert û li şûna wê ked, berxwedanî û rastiya jinê pêşkêş kir."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Li Rojavayê Kurdistanê piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê jinê karîbûna ku gelek destkeftiyan bidest bixwe yek ji wan jî rahgandina jin bû. Herwiha Ji bo ku ew destkeftî were parastin û mafê jinê were misogerkirin di 28'ê hizêrana 2020'an Yekîtiya Raghandina Jin (YRJ) hate avakir. Bi vê avabûna re çapemenî û weşana jinê hîn zêdetir dewlemend bû û karîbû ku deng, reng, çîrok û berxwedaniya jinan ji raya giştî re bi rengê wê ya rast pêşkêş bike.

Di derbarê salvegera damezrandina Yekîtiya Raghandina Jin, Endama Meclîsa YRJ'ê Yara Mihemed ji Rojnemeya me re axivî.

**'Hişmendiya baviksalar serwer e'**

Yara Mihemed destnîşan kir ku di despêka avabûna rahandin jin rojnemevan û nûçegihanên jin rastî neqebûlkirinê dihatin û wiha got: "Em di demekê de ne ku hişmendiya baviksalar serwere, bi her awayî dixwazin deng û rengê jinê winda bikin, mafê jinê binpê dikin bêyî ku kes hesabê ji wan bixwaza û mafê jinê biparêz e. Herwiha jinê bi hêsanî nikarîbû ku cihê xwe di xebat, biryardayîn û rêveberiyê de bigire, hişmendiya paşverû û zayendperest a ku di nava civakê de dimeşiya ev derfet nedida jinê. Rojane jin rastî lêdan, tundî û kuştinê dihat, çîroka biêş ya wê jinê bi wê re bin ax dibû, bêyî ku kes biaxive û sûcdar cezabike ango vê bûyerê dijmirovî ji raya gîştî re pêşkêş bike. Raghandina jin li ser vê esasê û ji bo derxistina dengê jin, parastina mafê wê, raghanidna ked û çîrokên wê hate avakirin.

Di destpêka avakirina raghandina jin de, rojnemevan û nûçegihanên jin rastî neqebûlkirinê û berdetekên civakê dihatin ji ber qebûlnedikirin ku jin bibe pêşeng û dengê rastiyê, lê raghandina jin bi israr û têkoşîna xwe xebata xwe berdewam kir. Îro em dibînin ku jin bûye nûçegihan, edîtor, pêşkêşvan û hwd.. ev jî encama ked û têkşîna bi sala ye."



**'Parastina mafê jinê û pêşkêşkirina keda wê berpirsyarê raghandina jin e'**

Yara Mihemed da zanîn ku raghandina jin dengê hemû jinan e û wiha domand: "Beriya avakirina YRJ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rahgandina jinê hebû, hemû bûyerên girêdayî jin li herêmê û cîhanê di heman demê de bûyerên civakî, siyasî, aborî, ekolojî û hwd bi çav û fikira jinê dihatin amadekirin, şopandin û weşandin. Herwiha ji bo parastina mafê jinê û pêşkêşkirina deng û keda jinê raghandina jina berpirsyarê herî mezin bû. Raghandina jin hemû bûyer û geşadanên ku di hundir herêmê û derveyî wê çêdibûn dişopand û dibû dengê wî gelî. Herwiha raghandina jin sîwana sereke ya hemû rojnemevan û nûçegihanên jin bû ku bi hemû awayên parastina mafê rojnamevanên jin dikir."

**' YRJ'ê hewildide xwe li hermên Sûriyê birêxistin bike''**

Yara Mihemed tekez kir ku di 28'ê hizêrana 2020'an de YRJ'ê hate avakirin û wiha pê de çû: "Yek ji encamêm konferansa 3'emîn a raghandina jin avakirina Yekîtiya Rahgandina Jin (YRJ) bû. YRJ'ê li ser esasê avakirina sîwaneke taybet ji rojnemvanên jin re di heman demê de ji bo ku bibe cihê lêvegerandinê ji hemû rojnemevanên jin re û bibe berpirsyariya wan rojnevanên hate avakirin. Ev 6 salin YRJ'ê kar û xebatê xwe di vê çarçoveyê de didomîne. Hersal konferansê xwe lidardixin ku tê de meclis avadike û guhertinan çêdikin.

Piştî ketina Rêjîma Baas Sûriyê di rewşeke cûda re derbas dibe, ji bo vê jî çawa ku YRJ'ê xwe di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de birêxistin kir, hewildide ku xwe li hermên cûda yê Sûriyê jî rêxistin bike û bibe dengê tevahî jinan li Sûriyê. Bi wê hewildanên xwe YRJ'ê dixwaze bibe xeta parastinê li hember hemû cûreyên êrişan li ser jinan."




**''YRJ'ê hemû zemîn di weşanên xwe de guhertin''**

Yara Mihemed daxuyakirin ku rola YRJ'ê di çapemeniya azad de girînge û wiha anî ziman: "YRJ'ê û Rojnemvanên jin bi deng û xebata xwe rengeke cûda dan weşanê cîhanî, ji ber ku dema em li çapemeniyên dîtir meyze dikin, em dibînin ku weşanên li ser jin gelek kêmin anjî mijarên ku têkildarî jinê digirin dest bi terzekî biçûkxistinê ye. YRJ'ê ev hemû zemîn di weşanên xwe de guhert ku rastî, têkoşîn, berxwedanî, ked, pêşnegî û hêza jinê hîn bêtir derxist pêş. Îro bi taybet li Rojavayê Kurdistanê ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi şoreşa jinê tê naskirin ku jinê tê de pêşang, rêveber, şervan, memoste û rojnemevan bû pêwîstbû ku bi deng û kemîreya jinê ew yek ji rawa gîştî re were eşkere kirin. YRJ'ê xwast ku rol û misyona jinê bi rêya Rojnemevanên jin pêşkêş bike. Herwiha ji bo şoreşa ku jinê li Rojavayê Kurdistanê lidarxistiye bibe mînakek ji hemû jinan re rojnemevanên jin xwastin ku bighînin hemû jinên cîhanê da ku ew jî bibin pêşang û mûmek ji jiyanek nû re, di heman demê de daxwaza mafê xwe bikin. YRJ'ê li ser vê esasê xwe avakir û hîn jî bi vî rengî karê xwe berdewam dike."

**''YRJ'ê hewaldide ku têkiliyên xwe bi rojnemevanên jin li Sûriyê re avabike''**

Endama Meclîsa Yekîtiya Raghandina Jin (YRJ) Yara Mihemed di dawiya axaftina xwe de wiha got: "YRJ'ê dixwaze di nava xwe de hemû reng û dengên jinan li Sûriyê bigire. Di planên Yekîtiya rahgandina jin de heye ku bi boneya 28'ê Hizêranê damezrandina yekîtiya me saziyeke fermî were vekirin, ku hemû rojmevanên jin berê xwe bidinê. YRJ'ê dixwaza têkiliyên xwe bi hemû jinên rojnemevan li Sûriyê çêbibe û danûstandinek di navbera wan de çêbibe. Nêrîna wan rojnevanan derbarê rewşa jin li Sûriyê çiye, herwiha rewşa rojnemevanên jin li Sûriyê di çi astê de ye û çawa dikarin bipêş bixin nîşaq bikin."

Ji Ramanên Jin



Bêrîtan Xalid

## Berxwedana jinan li ser şopa YPJ'ê

Berxwedana jinan di Rojhilata Navîn de tenê çîrokeke leşkerî nîne, lê di heman demê de çîrokeke guherandina civakî, azadî û îradeyê ye. Dema ku em ji Şengalê heta Reqayê li vê şopê dinêrin, em dibînin ku jin bi hêza xwe dîrokek nû nivîsand. Di pêvajoya ku ji Helebê heta Şengalê, ji Kobanê heta Reqqayê dirêj bû de, YPJ di şerê li dijî DAIŞ'ê de û di veguherîna rolên civakî yên jinan de bû hêzek diyarker. Ezmûna şervanên jin îro bûye yek ji mîrateyên herî girîng ên berxwedana jinan li herêmê. Li Şengalê, dema ku gelê Êzidî rastî ferman û qirkirinê hat, gelek jin rastî êş û dijwariyên mezin hatin. Di wê demê de hêzên YPJ, bi rexistina xwe û bi ruhê fedakarî, di vekirina korîdorên ewlehiyê û rizgarkirina hezaran sivîlan de roleke girîng lîstin. Ji bo gelek jinan, ev tenê alîkariyek ne bû; ew bû destpêka baweriya ku jin dikare hem xwe û hem jî civaka xwe biparêze. Piştî Şengalê, ev berxwedan li Kobanê û dûv re li Reqayê berdewam kir. Li Reqayê, YPJ ne tenê li dijî terorê şer kir, lê di heman demê de nîşan da ku jin dikare di hemû qadên jiyanê de pêşeng be. Wê berxwedanê peyameke eşkere da, jin ne tenê qurbaniyê şeran e, ew dikare bibe rêveber, parêzer û avakerê aştiyê. Şopa YPJ ji Şengalê heta Reqayê, şopa fedakarî, hevaltî û baweriya bi azadiyê ye. Navên gelek şehîdan di vê rê de wekî sembolên berxwedanê mayîn. Ew bi xwîna xwe nîşan dan ku nirxên wekî azadî, wekhevî û biratiya gelan bi hêzeke mezin tên parastin.Îro jî gelek jinan li ser heman şopê dimeşin. Ew dibêjin ku berxwedan tenê bi çekê nîne,bi zanîn, bi rêxistin, bi çand û bi xebata civakî jî berdewam dibe. Ji ber vê yekê, şopa YPJ ji Şengalê heta Reqayê tenê bîranîneke dîrokî nîne, lê ji bo gelek jinan bûye çavkaniya hêvî, hêz û îlhamê. Zêdetirî deh salan e, Yekineyên Parastina Jin (YPJ) a ji hêzek jinan a nû ku di şert û mercên awarte de hatiye damezrandin e, li Rojhilata Navîn û cîhanê bûye yek ji ezmûnên leşkerî yên jinan ên herî berbiçav. Ji 4'ê Nîsana 2013'an a dema damezrandina YPJ'ê ya li Rojava şûnde, dîrokek ku bi rojbûna Rêber Abdullah Ocalan re hemwext hatiye bijartin, wek sembola rewşenbîrî û siyasî ya projeya rizgariya jinan tê dîtin. Navê Yekîneyên Parastina Jinan bûye hevwateya parastina civakên herêmî û şerê li dijî rêxistinên radîkal. Her wiha jin beşdarî qadên cûrbecûr bûn, bi taybetî jî qadên leşkerî û ewlehiyê ku demek dirêj e ji hêla mêran ve têne serdestkirin.Li gorî vê vegotinê, ezmûna YPJ'ê bi pêvajoyên ji parastina bajar û gundan bigre heta azadkirina sivîlan li Şengalê, dabînkirina piştgiriyê ji bo azadbûyan û ji nû ve pênasekirina rola jinan di jiyana giştî de ve girêdayî ye. Di dawiyê de, berxwedana jinan nîşan dide ku civakek azad bêyî azadiya jinan nayê avakirin. Her gav ku jin bi îradeya xwe li ser erdê xwe radiweste, hêvîya civakeke demokratîk û aştiyane hîn zêdetir hêz digire. Ji Şengalê heta Reqayê, ev şop di dîrokê de wekî şopa berxwedan, fedakarî û azadiyê dê her dem bimîne.



# Ji destpêka salê ve li Erebistana Siûdî 100 kes hatin darvekirin

Ji destpêka salê û vir ve li Erebistana Siûdî 100 kes hatin darvekirin. Di heman demê de bi dehan kes jî hîn ji ber sûcên têkildarî madeyên hişberê bi cezayê mirinê re rû bi rû ne.

**Navenda Nûçeyan**

Wezareta Karên Hundir a Erebistana Siûdî bi daxuyaniyek ragihand ku roja sêşemê 23'ê meha Pûşperê, 7 kes hatin darvekirin û hat gotin ku ji kesên hatin darvekirin pênc jê bi sûcdariya bazirganiya madeyên hişbirê hatibûn mehkûmkirin. Bi vî rengî ji destpêka sala 2026'an û vir hejmara kesên li Erebistana Siûdî hatine darvekirin gihîşt 100 kesî.

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ev hejmar weke 'Qonaxeke tarî ya asta dijberiya hiqûqê û bikaranîna cezayê mirinê ji aliyê otorîteran ve' pênase kir. Li gorî daneyên AFP'ê, ji 100 kesên ku ji destpêka salê û vir ve hatine darvekirin 65 ji wan ji sûcê madeyên hişbirê hikum xwaribûn.

**Kesên biyanî barê herî giran hilgirtin**

Hat ragihandin ku ji kesên hatine darvekirin 52 ji wan biyanî bûn. Mirovên ji Etiyopya, Pakistan, Sûdan, Yemen û Sûriyê di nava kesên hatin darvekirin de hebûn. Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî di rapora xwe ya dawî de ragihand ku herî kêm 63 mehkûmên Etiyopyayî yên li girtîgeheke li başûr-rojavayê Erebistana Siûdî têne ragirtin û bi sûcdariya narkotîkê hatine mehkûmkirin, dibe ku di demeke nêz de bêne darvekirin. Rêxistinê bang kir ku cezayê darvekirinê bê rawestandin û doz li gorî pîvanên hiqûqa navneteweyî jinûve bêne nirxandin.

**Divê ev kiriyên hovane bêne rawestandin**

Rêxistinê ev yek destnîşan kir: "Pêla darvekirinan li Erebistana Siûdî meyleke cîhanî ya xeternak a zêdebûna girêdayîbûna bi cezayê darvekirinê ji ber polîtîkayên cezayî yên têkildarî madeyên hişberê, nîşan dide. Divê civaka navneteweyî bi awayekî bê guman li dijî van darvekirinên neqanûnî derkeve, di heman demê de divê Erebistana Siûdî tavilê li ser karanîna vê cezayê hovane û bêveger wekî gaveke yekem a girîng ber bi rakirina wê ve raghîne."

Di navbera 1'ê Çile û 22'ê Hezîrana 2026'an de, Erebistana Siûdî 96 darvekirin pêk anîne, ku 61 ji wan ji ber sûcên têkildarî madeyên hişberê bûn. Ji kesên ku ji ber sûcên têkildarî madeyên hişberê hatine darvekirin 39 welatiyên biyanî yên ji Etiyopya (7), ji Pakistan (7), Sûdan (5), Urdin (4) û Sûriyê (3) bûn. Di heman demê de ji neteweyên din jî hebûn. Heriwha 22 kes welatiyên Siûdî bûn.

**Piştî Çîn û Îranê, Erebistana Siudî di rêza sêyemîn de ye**

Erebistana Siûdî yek ji welatên cîhanê ye ku di warê darvekirinê de yê herî pêşîn e. Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî tenê di sala 2025'an de li Erebistana Siûdî herî kêm 356 darvekirin tomar kiriye, ku ev hejmar du qat ji hejmara ku di sala 2024'an de hatiye tomarkirin (122) zêdetir e.



Di navbera Çileya 2014 û Hezîrana 2026'an de, rayedaran 2 hezar û 84 kes darve kirin. Welatiyên biyanî bi awayekî nehevseng bandor bûn, ku di sala 2024'an de ji sedî 75 û di sala 2025'an de ji sedî 78 darvekirinên têkildarî madeyên hişber pêk anîn.

Erebistana Siûdî li gorî hejmara darvekirinên çar salên dawî li cîhanê piştî Çîn û Îranê di reza sêyemîn de ye.

**Rêxistina Efûya Navneteweyî nerazîbûna xwe dubare kir**

Rêxistina Efûya Navneteweyî di hemû şert û mercan de û bê îstîsna nerazîbûna xwe ya li dijî cezayê mirinê dubare kir û tekez kir ku ew kampanyayên xwe yên navneteweyî ji bo rakirina tevahî ya vê cezayê didomîne, ji ber ku ew cezayek hovane û bêveger e û binpêkirina mafê jiyanê pêk tîne.

# Pêla germahiyê li Ewropayê zêde dibe

**Navenda Nûçeyan**

**Pêla hewaya germ a li rojavayê Ewropayê ji astên normal derbas bûye. Li Fransayê bilintirîn rêjeyên germahiyê hate tomarkirin û welatên din ên Ewropayê jî dest bi standina tedbîrên derasayî kirin.**

Tirên rawestiyane, bajarên mezin di bin înzara sor de ne. Ewropa bi pêlek germahiyê ya bêhempa re rû bi rû ye ku germahî ji 40 pileya Celsius derbas dibe, herwiha dibe sedema mirinan û girtina tesîsên girîng.

**Ji sedî 90 zêdetir welatiyên Fransî bandor bûne**

Li Fransayê, Serokwezîr Sebastien Lecornu roja Sêşemê (23'ê Hezîrana 2026'an) ragihand ku ji 18'ê Hezîranê ve 40 kes ji ber pêla germahiyê ya dijwar jiyana xwe dest dane, di nav wan de zarok û kesên bi temen mezin jî hene. Di heman demê de Fransayê roja çarşemê (24'ê Heîzrana 2026'an) li ser hev çar caran hişyariya hewayê germ da. Li seranserê welêt ji bo 58 bajaran hişyariya asta herî bilind hate dayîn, li gel herêmên ku di bin hişyariya torincî de ne jî zêdetirî ji sedî 90'ê nifûsê bi germahiya zêde re rû bi rû mane.

Saziya Meteorolojiyê ya Fransayê (Meteo-France) diyar kir ku roja duşemê 'roja herî germ' a ji sala 1947'an ve bû. Rêjeya nîvekî ya germahiyên li seranserê welêt gihîşt 29,8 pileyan û ji rekorên salên 2003 û 2019'an derbas kirin. Li herêmên rojava asta germahiyê ji 40 pileyî derbas bû û li gelek deveran pileya germahiyê weke 39 û 41 hatin tomarkirin.



**Şewatên daristanan û pirsgirêkên enerjiyê**

Ji ber germahiyên zêde li hin herêmên Fransayê şewatên daristanan çêbûn. Hate ragihandin ku ji ber germahiyên zêde û kêmbûna çavkaniyên avê hilberîna santralên nukleerê jî hatine kêmkirin.

**Li Îtalya û Spanyayê alarma sor**

Wezareta Tenduristiyê ya Îtalyayê li 16 bajaran alarma hewayê germ da. Di serî de Bologna, Floransa, Milano û Torino li gelek bajaran bi rojan e germahî li ser 35 dereyan e. Rayedaran bang kirin ku welatî di saetên nava rojê yên gelekî germ de dernekevin derve, xwarinên sivik bixwin û gelekî avê vexwin. Li Spanyayê jî saziya meteorolojiyê ya neteweyî AEMET'ê li gelek deveran hişyariya alarma sor û torincî (rengê pirteqalî) da. Tê payîn ku li Nîvgirava Îber û Mayorkayê germahî bigihîjin 40 dereceyan.

**Belçîka, Almanya û Îngilistan jî bandor bûn**

Li Belçîkayê yek ji sembola Brukselê Atomîûm, ji ber germahiyên zêde saetên xwe yên serdanê kêm kirin. Li Parîsê jî ji bo Mûzexaneya Louvre û Qûleya Eyfelê heman tedbîr hatin girtin.

Li Almanyayê serwîsên meteorolojiyê hişyarî dan ku dibe germahî heya 39 dereceyan bilind bibin.

Li hin herêmên Îngilistanê jî dereceyên germahiyê gihîştin astên şikandina rekoran û hat diyarkirin ku wê têkildarî cil û bergên xwendekaran hin serastkirin werin kirin.

**Hewayê germ ber bi Ewropayê ve diçe**

Pisporên meteorolojiyê diyar dikin ku pêla hewayê germ wê di rojên pêş de ber bi rojhilatê Ewropayê ve biçe. Welatên weke Hollanda, Polonya, Avûsturya, Xirvatistan û Macaristan jî ji bo germahiya zêde amadehiyên xwe dikin.

**Niqaşên derheqê krîza avûhewayê dubare di rojevê de ne**

Pispor destnîşan dikin ku bûyerên hewayê germ ên li Ewropayê her ku diçe zêde dibin bi guherîna avûhewayê re têkildar in.

Li gorî Coprenicus a serwîsa çavdêriya avûhewayê ya Yekîtiya Ewropayê, Ewropa di pozîsyona parzemîna ku li gorî navîniya gerdûnî du qatan leztir germ dibe de ye. Tê diyarkirin ku ji ber vê yekê pêlên hewayê germ, ziwabûn û bûyerên hewayî yên derasayî wê di salên pêş de zêdetir xwe nîşan bidin.

# Dema em jin xwe dahurandin bikin dibe dahurandina hemû civakê

Leyla Amûdê

Ger ku em ji kesayetê xwe de destpê bikin û derkevin rêkê de, tekez wê guhertin û veguhertin ji bo me jinan weke çalaki hesan be lê ku em ji kesayeta xwe de destpê nekin û em her li derûdora; xwe her bigerin û wan tewanbar bikin wê demê jî wê tu guhertin û veguhertin, pêkan nebe û wê hemû xapandin û ji rê derketinbe. Ji ber wê tekez pêdivî heye ku em ji kesayeta xwe de destpêbikin û xwe ji warê fikrî, ruhî û jiyanî de lêpirsîn bikin; hun dizanin ku em hemû jî tewanbarin. Dibe ku hun pirs bikin çima gelo em tewanbarin başe ezê ji were vekim vê mijarê û ez bawerim ku hunê jî di nerînên xwe de hevkariya min bikin.

Weke ku me famkir mirovahî û herî zede jî jin ev 30 hezar salin ku dibin zordariya zilamê nîçîrvan de hatiye, kole kirin û di şexsê jinê de jî civak hatiye kole kirin û heyanî ku Rêber Apo qala wê nekir me haj livê rastiya dîrokî nebûye û dema ku; mirov haj lênebe ji xwe gazinc jî ji mirovan nabe lê dema ku mirov haj li wan rastiyan bû; gerek wan rêbazên kevnar û desthilatdariya zilamê tundrew û kujerê kastîk, hew qebûl bike û li hemberî wê rastiyê şiyar be û têkoşîn bike. Ji bo ku tişta ku hatiye jiyan kirin biguhere û dawiyê jî lêbîne. Lê mixabin di kesayeta me ya îroyîn de xemsariyeke pir mezin çêbûye û wiha li mirovan, hatiye kur eş û sipî li cem wan weke heve û ev jî pir xeternake û gerek şîyar bûneke pir xurt li ser vê mijarê were çêkirin.

Pergala desthilatdar û xasok ewqasî li ser hişê mirovan rawestiya ye ku, dizane wê bi şerê xwe yê taybet mirovan çawa bandor bike û li gorî dile wan; jî şerbete bide wan carnan dema ku zarokên dayikê xew nakin dayik gelek rêbazan, bikartîne û şerbet jî dinavê de gelek tişt dide zarokê xwe û dayik li wir famdike bêka zaroka wê bi çi bandor dibe û wê ew jî çawa zarokên xwe bandor bike û wan bide meşandin. Ji xwe pergala desthilatdarî jî hema wiha dike û dizane bêka wê çawa mirovan di warê, hişmendî de bandor bike û wan bike xewde dibe ku ev nimune pir; qels be jî yanî dayik û pergal dana berhev ji xwe qet pergala dayikê û pergala zilamê serwer weke hevdû nîne, lê weke nimune min xwest ku ez bidim û dibe ku baştir were famkirin.

Ji xwe dayik ji bo ku rabe haziriyê malê û xwar û barê bike wiha, ji dilekî pir saf dike û pêdiviyeke zaroke jî ku pir baş xew bike ji bo ku bedena; wî baş pêşbikeve û rebît be jî giringe lê pergala zilamê desthilatdar hemû civakê, dike nava xewda giran de ji bo ku rastiya wan a kujerê kastîk nebinin û ji wan re îtaetê û sertewandinê bikin. Pergal vêya bi nêteke pir xerab û xasok dike û tişta herî xerabtir jî ewe ku, civak evîndarê wê pergalê be yan jî hewilde ku weke wan kujerên kastîk; bibin bêguman civak wan kujerên kevnar û tund nasnakin ji xwe ger ku, nasîbana teke wê wan qebûl jî nekrana naxwe tişta ku pêdivî heye ku tekez were kirin jî ewe ku ferd û civak, pir baş werin perxwede kirin. Pergala desthilatdar a zilamê xapoker jî civak û ferde wê gelekî, perwerde kiriye û ji Musa Qadîn bigire û heyanî zanîngehên pergalê yên roja îro hemû; armancên xwe kedîkirina ferde civakê ye ji bo ku ew ferd jî xwe li ser, civakê ferz bikin û dinava wan de çînan çêbikin ji bo ku dinava civakê de ferq û cudayetî çêbikin.

Li welatê Sumeran Zîgurat çêkirin û keyê wan ê yekemin binasnav, Gilgamiş zilamê weke gamêşekî gir û bi heybet di serî de bi rêbazê xwe yê zilamane; jinan bandor dike û wan bi darê zorê dike bin siya xwe de û paşî hemû civakê jî weke jinan dike kole û li ser wan serweriyê dike û ên ku bi van karan radibin jî zilamên kal ên ku, li hemberî jinan hesud dibin û ciwanên zilam û jin li hemberî dayika xwedawend Îştar, birêxistin dikin û komploya yekem wiha destpê dike.

Tekez di serî de pêdivî heye ku em weke jin xwe lêhurbûn bikin, ji bo ku em di serî de xwe weke zayend nasbikin û piştî ku me xwe naskir emê zilamên; xasok û komploger jî binasin û wê deme jî emê pergala desthilatdar a ku nunertiya wan, zilaman dike jî binasin û emê li hemberî wê têkoşîn bikin. Her çiqasî em weke jin û civak jî dinavê de dibêjin ku me desthilatdarî famkiriye û em, li dijî wê têkoşîn dikin jî lê mixabin hîna jî em pir baş pergalê famnakin; ji xwe ger ku em fambikin emê têkoşîneke pir xurt bimeşînin û emê serkeftî bin, ji ber yê ku dijminê xwe nasbike tekez wê pir bi tundî li dijî wî têkoşîn bike û wê sekin û hedan jî lê nebe.

Lê mixabin em pir aramin û weke ku her dever gul û gulîstane, jî em nêzîkatî raber dikin û ev jî nenaskirina me ji me re weke xwebûn tê û ger ku em xwe; nasnekin bêguman emê nikaribin pergalê jî nasbikin û li hemberî wê jî têkoşîn bikin. Û tişta ku herî zora mirovan diçe û mirov ji xwe jî hêrs dibe jî ewe ku em xwedî Rêberekî weke Rêber Apo ne ku, dinava 24 katjimêran de têkoşîn dike û her katjimêrekê jî şoreşekê dinava xwe de çêdike û ewqasî jî herikbare; lê mixabin em pir berevajî kesayeta Rêberê xwe nebe û ev jî dihêle ku, em şermoke bin û wijdan ezabî jî bikişînin. Ger ku miletek Rêberekî wan weke Rêber Apo hebe û di rewşa me debin, birastî ji bo me şermeke pir mezine û em pir xemsar û dogmatîkin yanî fikren me dinava; pergala desthilatdar û hişmendiya wê de eliqî maye û cemidiye.

Ji ber wê guhertin û veguhertina me pir lawaze û meşa me jî weke ya kusiye, ji xwe gelek caran jî em li şuna xwe dihejmêrin û newêrin gavan jî bavêjin. Û ewqasî zanebûn, felsefe, îlîm û hunera siyasetêç li cem Rêberê me heye û weke deryayekê diherike û em jî weke buza; çiyayê Sîbîrya cemidîne û mejiyê me dinava qalibê teng de maye! Lê gerek em li do negirîn û em bibêjin em zarokên îro ne û em li ser xwe lêhurbûn bikin û li xwe, mukur werin û rexnedayîna xwe bidin ji bo ku fuikir û xebatên me herikbar bibin û em; gavên xurt bavêjin û pergala zilamê serwer ji ser jiyana xwe rakin û em wê xençera di pişta xwe de jî derxînin û xwe ji êşa wê rizgar bikin, ji bo ku em di warê wijdan de jî rihet bibin û em xizmeta paşeroja zarokên rojê bikin û ji wan re jiyaneke wekhev, azad û demokratik avabikin.

# Ji bo tu mafê xwe bi dest bixî zimanê xwe bike bingeha jiyana xwe

Aya Idrîs Elmecîd

Zimanê Kurdî ne tenê axaftin an jî xwendin û nivîsandine , zimanê Kurdî hebûna gelê Kurd e ,Kurdan salên dirêj ji bo parastina zimanê xwe canê xwe kirin fedayê ziman, hebûn û nasnameye xwe. Di dema rêjîma baas de Kurd bi hisret bûn ku bi zimanê xwe biaxifin heya ku bi hisret bûn jî ku bêjin em Kurd in , her ev êş di dilê Kurdan de bû ji ber ku tiştê herî zehmet tu li ser axa welatê xwe bijî, lê desthiladar nehêlin ku tu bi ziman , nasname , çand xwe were naskirin , ev êş tenê gelê Kurd dizane eger em dîrokê baş bixwînin û lêkolîn bikin em ê bibînin Kurd tevî ewqas zor û zehmetiyan wan neheqiya derheqê wan de hatiye kirin qebûl nekirin. Kurdên agir û rojê dest ji mafê hebûna jiyan xwe bernedan ji ber ku maf ne bi xêrê tê stendin lê bi berxwedanî û lehengiyê tê bidest xistin Kurdan bi vî rengî di dema desthiladariya baas de zimanê xwe parastin ji wê demê heyanî şoreşa Rojava Kurdan destkeftiyek pir mezin bidestxis ku êdî dawî li zilmê anîn û bi fermî di dibistan û zanîngehan de fêrî zimanê xwe bûn. Êdî Kurd di vir de gotin : xewn û xeyalê me û yê bav û kalê me pêk hatin li şûna êş û birîna di dilê Kurdan de kêf û şahî cihê xwe girt ji ber ku ew keda şehîdan li erdê vala nerijiya lê bi xwîna van şehîdan gelên Kurd hebûna xwe misoger kirin, niha jî her kurdek welatparêz xwedî li Kurdatiya xwe derdikeve û diparêze ji ber ku qelenê zimanê Kurdî xwîna şehîdan e. Ji bo vê yekê em Kurd bi zimanê xwe yê pîroz serbilind in, dîsa jî em derbasî pêvajoyek nû dibin ew jî bi hatina hukmeta demkî re ku heman rêbazê sîstema rêjîma baas dimeşîne û dixwaze zimanê Kurdan qir bike lê bila hukmeta demkî dîroka berxwedaniya Kurdan baş bixwîne di seranserî dîrokê de heya roja me ya îro de gelên Kurd ji pey doza Kurdatiyê maf çand û zimanê xwe ve venegeriyane , ji bo wê em ji hukmeta demkî re dibêjin bi lîstokên xwe yê qirêj nêzî zimanê Kurdî û nasnameye Kurdan nebe, ji ber ku wê Kurd mafê xwe ji hundirê reşika çavê we derxe eger hûn nêzî mafê Kurdan bibin.



# 2500 girtiyên Sûrî di zindanên Lubnanê de ne

**Di dema heyî de weke yek ji encamên kirîza Sûriyê dosya girtiyên Sûrî di zindanên Lubnanê de ne rojeveke. Ji destpêka peyman di navbera Beyrût û Şamê de çêbûye 260 girtiyên Sûrî bo hikumeta demkî hatine radestkirin, hejmara girtiyan ya giştî ku di zindanên Lubnanê de dimînin, 2500 e.**

Navenda Nûçeyan

Di 10'ê Cotmeha 2025'an de hikumeta Lubnan û ya Sûriyê xalên bingehîn ji bo îmzekirina peymanekê danîn, peyamana têkildarî veguhestina girtiyên Sûrî yên ku di zindanên Lubnanê de bû. Ev veguhestin li ser bingeha lihevkirina 6'ê Sibatê de li Beyrûtê dest pê kir.

Lubnanê di 24'ê Pûşperê de li gorî xalên rêkeftina dualî ya di navbera herdu welatan de ya Sibatê de hatibû îmzekirin, komeke duyemîn a ji 128 girtiyên Sûrî pêkdihat, radestî hikumeta demkî ya Sûriyê kirin. Armanca rêkeftinê ew e ku girtiyên Sûrî vegerînin welatê xwe da ku li welatê xwe werin dadgehkirin. koma duyemîn a girtiyên Sûrî yên Lubnanê radestî Şamê kirin; ji 128 kesan pêkdihat

Ev veguhestin zêdetirî sê mehan piştî veguhestina destpêkê ya 132 mehkûmên di 17'ê Adarê de pêkhat û hejmara giştî ya kesên ku heta niha radestî Şamê hatine kirin digihêje 260 kesan.

Wezîrê Dadê yê Sûriyê Mezher Elweys roja Sêşemê, bi rêya bernameya X, hatina nêzîk a vê koma nû ya 128 girtiyan ragihand û spasiya xwe ji hemî kesên ku di çarçoveya hevkariya berdewam a di navbera her du welatan de beşdarî vê gavê bûne re anî ziman.

Agahiyên girêdayî rewşa ewlehiyê nîşan didin ku hejmara giştî ya mehkûmên Sûrî yên ku cezayên xwe li girtîgeha Romiyê ku mezintirîn girtîgeha Lubnanê ye, diqedînin, nêzîkî 356 kes e. Ev tê vê wateyê ku pêvajoya radestkirinê ya dosyaya têkildarî girtîgeha Romiyê çareser kir û tê payîn ku veguhestina komên mayî wê di mehên pêş de li gorî şertên peymanê were temamkirin.

Li gorî qada ewlehiyê ya Lubnanî nêzîkî du hezar û 500 girtiyên Sûrî di girtîgehên Lubnanê de ne. Tawanên wan ji sûcên têkildarî terorê bigire heya endametiya di rêxistinên tundrew û komên çekdar de ne û ew ji dadgeha leşkerî re hatine şandin.

Di dosyayên van girtiyan de kesên ku bi êrîşkirina li dijî artêşa Lubnanê, bi taybetî li herêmên sînorê rojhilat di dema kirîza Sûriyê de têne tawanbarkirin jî hene. Van deveran pevçûnên dijwar dîtin û ev kes di encama destwerdana Hizbullah




di kirîza Sûriyê de li kêleka hêzên rêjîma Baas, hatin girtin.

Pirsgirêka girtiyên Sûrî yek ji mijarên herî berbiçav ên di rojeva hevbeş a di navbera Beyrût û Şamê de ye, mijarek ku bi salan e ji ber hejmara zêde ya girtî û sûcdaran tê nîqaşkirin.

Hewldanên ji bo normalîzekirin û ji nûveorganîzekirina têkiliyên dualî ne tenê bi vê pirsgirêkê ve sînordar in, lê belê di nava xwe de pirsgirêkên din ên aloz ên ku li benda çareseriyê ne, di nav de destnîşankirina sînor, têkoşîna li dijî qaçaxçîtiyê, pirsgirêka kesên winda û pirsgirêka penaberên Sûrî li Lubnanê dihewîne.

Radestkirina dawî vîneke siyasî û dadwerî ya hevpar ji bo çareserkirina van pirsgirêkên berbiçav nîşan dide. Nemaze di nava guhertinên siyasî yên ku Sûrîye di du salên borî de dîtiye û çareserkirina pirsgirêka girtiyan di danûstandinên dawî yên di navbera her du hikumetan de xwdî girîngiyeke bû. Lê pirs di vê derê de dimîne… Gelo wê hikumeta demkî ya Sûriyê bi çi awayan bi vê dosyayê re tevbigere, wê dadweriyeke çawa li ser girtiyan pêkbîne. Nexasim ku rewşên kuştina bêserûber, tolhilandin, kuştina veşartî, bêdadwerî li seranserî Sûriyê gelekî berbelav bûye.

# Tirkiyê li ser xaçerêyekê ye: Ketina maskeya rojava û hilweşîna xeyalên dewletneteweyê

Cemîl Xoce

Ji destpêka avabûna xwe ve, Komara Tirkiyeyê hewl dide xwe wekî beşeke ji sîstema Ewropayê nîşan bide û maskeya Rojava wekî rêyekê ji bo dûrketina ji rastiya xwe ya erdnîgarî û çandî ya li Rojhilata Navîn bi kar tîne. Lê belê, nûçeyên dawî yên derbarê hewldana Washingtonê ya ji bo ji nû ve kategorîzandina Tirkiyeyê wekî welatekî ji seksiyona "Rojhilata Navîn" li şûna seksiyona "Ewropa û Awrasyayê", rastiyeke tal eşkere dike ku elîtên serdest ên Enqereyê her tim hewl didan jê bireviyana. Serdema xeyalan bi dawî bûye û dema rûbirûbûna rastiyên tal dest pê kiriye.

Ev biryara ku tê behskirin, ne tenê gaveke burokratîk e, lê danpêdaneke navneteweyî ya eşkere ye ku "ezmûna Tirkiyê" ya ji bo yekkirina strukturên dewletneteweya otorîter bi daxwazên demokratîk ên rojavayî re têk çûye. Di warê dîrokî de, gera li pey "nasnameya ewropî" ji serdema Kemalîst dest pê kir û bi daxwaza endametiya tam a di salên şêstî de berdewam kir. Lê derî li ber Enqereyê girtî man; ne tenê ji ber sedemên olî yan erdnîgarî yên ku siyasetmedarên tirk her tim ji bo raya giştî digotin, lê ji ber naveroka sîstema tirkî bi xwe. Rojava zû fêm kir ku dewleta ku pirrengiyê red bike, polîtîkaya înkara neteweyî bimeşîne û di çareserkirina pirsgirêkan de serî li rêbazên leşkerî bide, nikare di sîstemeke ku qaşo di bingeh de li ser maf û azadiyên takekesî ava bûye de cih bigire.

Krîza dewleta Tirk a îro, krîzeke kûr a strukturî ye. Ev dewlet bi tundî girêdayî modela "dewletneteweyê" maye. Wê ev model di sedsala 19'an de ji Ewropayê wergirt û kir amûreke ji bo perçekirina tevna civakî. Gava ku dewlet îsrar dike ku çandên cuda di nava qalibeke neteweyî ya yekgirtî de bihelîne, ew bi vê yekê sedema çêbûna cihên nakokiyên daîmî û civakê ber bi perçebûnê ve dikişîne. Ev yek Tirkiye, bi biryara xwe be yan jî bêyî wê be, kişandiye nava xetimandinekê; ji ber ku wê "neteweyeke demokratîk" a ku dikare pirrengiyê bihewîne ava nekir, lê "dewleteke ewlehiyê" ya ku xwe dispêre destwerdanên leşkerî ava kir.

Îro analîzên siyasî yên rast nîşan didin ku projeyên perçebûnê yên navneteweyî, ne çarenivîseke ku neyên guhertin in, lê encameke neçar a lawaziya dewletên ku red dikin veguherîna demokratîk pêk bînin. Her dewleteke ku li şûna diyalogê, zordariyê hildibijêre û li şûna rêveberiya xwecihî, navendgeriya neteweyî hildibijêre, bi xwe amadekariya perçebûna xwe dike. Gava Rojava biryar dide ku Tirkiyeyê ji nû ve kategorîze bike, di rastiyê de radigihîne ku "projeya neteweyî ya tirkî" êdî nikare wekî amûreke ji bo aramiya herêmê bê bikaranîn.

Derketina ji vê "golê" ne hewceyî guhertina kategorîzandina dîplomatîk a li Wezareta Derve ya Amerîkayê ye, ne jî hewceyî nermbûna li hember Brukselê ye. Derketina ji vê tengasiyê hewceyî şoreşeke ramanî ya rastîn di nava civaka tirk de ye. Pêwîst e ku ji zihniyeta dewletneteweyê ya teng were dûrketin û bê qebûlkirin ku hêz ne di yekrengiya nijadî yan zimanî de ye, lê di pirrengiya çandî û jiyana biaştiyane de ye. Modela herî guncaw ji bo herêmê, modela "neteweya demokratîk" e; modela ku dibêje pirrengî çavkaniya hêzê ye û rêveberiya xweser garantora herî mezin a li hember projeyên perçebûnê ye.

Gelek xeterî hene, lê ew xeterî li hember kesên ku bi îsrar li dijî herika dîrokê avjeniyê dikin, derdikevin. Pêşeroja vê herêmê ne ya wan hêzan e ku li pey hevalbendiyên derve digerin, lê ya wan hêzan e ku rewayiya xwe ji nav civakên xwe digirin. Heger Enqere di polîtîkayên xwe yên niha de îsrar bike, wê di Rojhilata Navîn de ne wekî dewleteke bibandor, lê wekî dewleteke perçebûyî ya ku ji encamên siyasetên li dijî gelên xwe dikişîne, cih bigire.

Bi kurtasî, Tirkiye ne hewceyî "Ewropayê" ye ji bo pêşketinê, ne jî hewceyî "Rojhilatê" ye ji bo bibe xwedî girîngî. Tenê hewceyî wê yekê ye ku li ayîneyê binêre û qebûl bike ku serdema "dewletneteweyê" bi dawî bûye. Rêya aramiya rastîn di demokrasiya rastîn, naskirina mafên hemû kesan û devjêberdana polîtîkayên şer de derbas dibe. Dîrok ji aliyê wan kesên ku civakên xwe li ser bingehê azadî û dadmendiyê ava dikin tê nivîsandin. Pirs ev e: Gelo desthilatdarên Enqereyê wêrekî têra wê heye ku ji vê xeyala neteweperestiyê derbas bibin û peymaneke civakî ya nû ava bikin, yan wê di nav xeleka şer û perçebûnê de binav bibin?

# Ji Şerê Cîhanê yê Yekemîn heta yê Sêyemîn: Guhertina stratejî û siyaseta cîhanê

Stratejiyên Şerê Cîhanê yê Yekem, Duyem û niha jî yê Sêyem ji hev cuda dibin. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de, artêşan bi giranî di xendekan de şer dikirin, lê stratejiya Şerê Cîhanê yê Duyem li ser tevgera bilez, êrişên hevbeş û karanîna teknolojiyê sekinî. Di yê Sêyemîn de jî stratejî guhertina sîstemên sedsalê û pêşketina kapîtalîzma malî li hemberî ya pêşesazî ye.

Ronahî Sadûn

### Şerê cîhanê yê yekemîn

Şerê Cîhanî yê Yekem yek ji mezintirîn û xwînrêjtirîn şerên dîroka mirovahiyê bû. Ev şer di 28'ê Tîrmeha 1914'an de dest pê kir û heta 11'ê Mijdara 1918'an dom kir. Sedema sereke ya destpêka şer kuştina Arşîduk Franz Ferdinand li Saraybosnayê bû. Lê belê, reqabeta di navbera hêzên mezin, çekan û peymanên leşkerî de roleke girîng di destpêka wê de lîst. Şer bi giranî li Ewropayê hate kirin, lê bandorên wê li Afrîka, Rojhilata Navîn û deverên din ên cîhanê belav bûn. Bi mîlyonan leşker û sivîl beşdarî şer bûn, bajar û gund hatin wêrankirin û mirovên bêguneh gelek êş kişandin. Di encama vî şerî de tê texmînkirin ku 16 heta 20 milyon mirov jiyana xwe ji dest dan û zêdetirî 20 milyon kes birîndar bûn. Van windahiyên wêranker li gelek welatan bûn sedema guhertinên siyasî, aborî û civakî. Di 11'ê Mijdara 1918'an de, agirbestek hate îmzekirin û bi fermî şer bi dawî kir. Piştî wê di sala 1919'an de, Peymana Versailles (Versayê) hate îmzekirin ku şertên aştiyê destnîşan kir. Her çend vê peymanê şer bi dawî anî jî, bendên wê paşê bûn yek ji sedemên sereke yên destpêkirina Şerê Cîhanê yê Duyemîn. Ji ber vê yekê, Şerê Cîhanê yê Yekem di dîrokê de wekî şerekî xwînî û bi bandor tê zanîn ku bandorên wê îro jî di dîrok û siyaseta cîhanê de xuya dibin.

### Şerê Cîhanê yê Duyem

Şerê Cîhanê yê Duyemîn di 1'ê Îlona 1939'an de dema ku Almanya êrişî Polonyayê kir, dest pê kir. Piştî vê yekê Brîtanya û Fransayê li dijî Almanya şer ragihandin û şer bi lez belavî beşên mezin ên Ewropa, Asya û Afrîkayê bû. Di navbera salên 1939 û 1945'an de, bi mîlyonan leşker û sivîlan di şer bi bombebaran û komkujiyan de jiyana xwe ji dest dan. Li gorî raporên heyî tê texmînkirin ku di navbera 70 û 85 mîlyon kesan de di şer de mirine, ev jî dibe pevçûna herî kujer a dîroka mirovahiyê. Di dawiya şer de hêzên Hevalbendan serketî bûn. Almanya di Gulana 1945'an de teslîm bû û Japonya di 2'ê Îlona 1945'an de piştî bombebarana atomî ya Hîroşîma û Nagazakî, teslîm bû. Ev yek bi fermî şer bi dawî kir. Lê bidawîbûna şerê cîhanê yê duyemîn nebû dawîbûna şeran berovajî wê niha rê li ber şerê cîhanê yê seyemîn jî hatiye vekirin. Lewra şerê Cîhanê yê Duyemîn hîn jî derseke bihêz di dîrokê de ye. Wê nîşan da ku şer tenê wêranî, koçberî û windakirina jiyanê tîne, ji bo wê aştî û jiyana hevbeş ji bo pêşeroja mirovahiyê girîng in.

### Cudabûna şerên cîhanê yê yekem û duyem ji hev çi ne?

Stratejiyên Şerê Cîhanê yê Yekem û Şerê Cîhanê yê Duyem ji hev cuda bûn. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de, artêşan bi giranî di xendekan de şer dikirin, leşkerên wan di xetên parastinê de asê mabûn û pêşketin pir hêdî bûn. Armanc ew bû ku xak û çeperên dijmin werin girtin. Lê belê di Şerê Cîhanê yê Duyem de stratejî guherî. Hêzên leşkerî bi karanîna tank, balafir û êrişên bilez û giştî dest pê kirin. Bi vî awayî, stratejiya Şerê Cîhanê yê Yekem li ser parastin û xendekan sekinî, lê stratejiya Şerê Cîhanê yê Duyem li ser tevgera bilez, êrişên hevbeş û karanîna teknolojiyê sekinî.

### Şerê cîhanê yê Sêyem ku niha rû dide

Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ji aliyên siyasî, çandî, aborî, ragihandinî û civakî ve taybetmendiyên xwe hene. Di vê şerî de armanc ne tenê têkbirina hêzên leşkerî ye, lê herwiha qirkirina civakê, şikandina îradeya gel û kontrolkirina hişmendiya civakê ye. Di Şerê Cîhanê yê Yekem û Duyemîn de neteweperestî rola sereke dilîst û gelek netewe hatin tasfiye kirin. Lê di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de civak bi xwe bûye hedefa sereke. Ji ber vê yekê ev şer ne tenê şerekî leşkerî ye, lê di heman demê de şerekî siyasî, çandî û ragihandinî jî ye. Di aliyê leşkerî de jî dewlet hene ku di nav şerê de ne. Lê



taybetmendiya sereke ya vê şerê ew e ku ne wek şerên berê ye. Berê cebhe di navbera du blokan de dihatin avakirin, gelek dewlet di aliyekî de û gelek dewletên din jî di aliyê din de bûn. Armanc ew bû ku aliyek bi ser bikeve. Lê niha rewş guheriye. Blokên berê bi heman awayî nînin. Dewlet bi xwe ji bo berjewendiyên xwe şer dikin û hewl didin ku bibin hêza herî bihêz. Ev yek ji taybetmendiyên girîng ên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn e. Mînak, heta di nav NATO de jî siyasetên dewletan ji hev cuda ne. Her dewlet li gorî berjewendiyên xwe tevger dike û carinan ev siyaset li hemberî hev têne bikaranîn. Berê pir caran dihat gotin ku siyaseta dewletên NATO yek e, lê niha ev yek rast nîne. Di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de stratîjîya bingehîn ew e ku kîjan dewlet dikare bibe hêza hegemon a cîhanê. Ji ber vê yekê nakokiyên di navbera dewletan de her ku diçe zêdetir dibin. Dewleteke ku aboriya wê bihêz be, hêza leşkerî ya xurt hebe, siyaseta bi bandor û pergala ragihandinê ya bihêz hebe, ew dikare di asta cîhanî de bibe hêzeke serdest.

### Siyaset êdî çi ye?

Piştî hilweşandina her du avahiyên çêwî yên li Washingtonê, cîhan ket qonaxeke nû ya şerê cîhanê yê sêyemîn. Hilweşandina van her du avahiyan ne tenê hilweşandina du avahiyan bû, lê belê nîşana dawîhatina qonaxeke sed salî jî bû. Rewşa cîhanê piştî vê bûyerê guherî. Sedema sereke ya vê guhertinê ew bû ku qonaxa kapîtalîzma pêşesazî (sînaî) bi dawî bû û qonaxa kapîtalîzma malî dest pê kir. Ji bo ku ev pergala nû pêk were, hêzên navneteweyî dixwestin dewletên ku li gorî pergala kapîtalîzma pêşesazî hatibûn avakirin, ji nû ve birêxistin an jî hilweşînin û li şûna wan pergaleke nû li gorî kapîtalîzma malî, ava bikin. Pergala kevin ew bû ku dewletên neteweyî li gorî berjewendiyên wê demê hatibûn damezrandin. Lê di qonaxa kapîtalîzma malî de, ew şêwaza dewletê êdî ne wekî berê pêwîst tê dîtin. Ji ber ku sermaye û fînanskapîtalîzm dikare bi hêsanî li seranserê cîhanê bigere û qazancê bike, pêdiviya pergala kevin kêm dibe. Li gorî vê nêrînê Şerê Cîhanê yê Sêyemîn şerê kapîtalîzma malî li hemberî kapîtalîzma pêşesazî (sînaî) ye. Guhertinên ku îro li Rojhilata Navîn tên kirin jî bi vê pêvajoyê ve têne girêdan. Ji ber vê yekê tê gotin ku lihevkirinên Sykes-Pîko û Lozan êdî di qonaxa dawiyê de ne û pergala ku li ser wan hate avakirin tê guherandin. Niha jî armanc ew e ku hemû dewlet li gorî şert û mercên kapîtalîzma malî ji nû ve bên birêxistin. Ji ber vê yekê dewlet di siyasetê de li gorî vê gotinê dimeşin ku: "Dijmin û dostên sabit tune ne; tenê berjewendiyên sabit hene." Ji ber vê yekê, di siyasetê de êdî nikare tişt bi awayekî sade wekî "rast an ne rast", "spî an reş" were şirovekirin. Dibe ku tu di hin mijaran de bi aliyekî re nakok be, lê di mijarên din de bi heman aliyî re hevkariyê bikî. Îro siyaseta cîhanê bi vî awayî tê meşandin. Wekî berê gotina "ev heta hetayê dostê min e an heta hetayê dijminê min e" êdî zêde rast nayê dîtin. Di siyasetê de divê mirov şert û mercan baş bixwîne û bi awayekî jêhatiyê tevbigere.

### Rêber Apo ji bo çareseriya mayînde çi gotiye?

Li ser siyasetê, Rêber Apo dibêje: "Êdî çek û şer weke berê nîne." ew diyar dike ku her du aliyên ku çek di destê wan de hene, çi yên serkeftî bibin û çi yên têk biçin, di dawiyê de windahiyên mezin jiyan dikin. Ji ber vê yekê, şer êdî nikare çareseriyeke mayînde biafirîne. Hem hêza mirovan û hem jî çavkaniyên aborî di şeran de têne windakirin. Ji bo wê li şûna bikaranîna çekan, divê di şert û mercên îro de hêza fikrî û siyasî were xurtkirin. Li ser vê bingehê jî hêza civakî pêş dikeve. Ev rê ji bo gihîştina çareseriyeke mayînde girîngtirîn rê ye. Rêber Apo di hemberî hemû van kirîz û şeran de çareseriyeke mayînde pêşkêş dike û dibêje: "Êdî stratîjî siyaseta demokratîk e, tektîk jî tekamula qanûnî ye." Li gorî vê nêrînê, şert û mercên cîhana îro jî vê rastiyê piştrast dikin. Ji ber ku cîhan di nav kirîzeke qanûnî û sîstematîk de ye û gelek sîstemên heyî bi îflasê re rû bi rû mane, hewcedariya avakirina sîstemeke nû zêde bûye, li ser vê bingehê jî gelek pevçûn û şerên Rojhilata Navîn têne meşandin.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî

Can Yûsiv

Helbestvan Emerê Lalê ; Parezvanê ziman û nasnameya Kurdî bi helbestên xwe"

Di destpêka salên pênciyan de, helbestvan û nivîskarên kurd ji bo şiyarkirina hişmendiya neteweyî û parastina zimanê kurdî ji pişavtinê rolek girîng lîstin , wan edebiyat bi taybetî jî helbest kirin amûrek ji bo parastina nasnameyê û derbirîna doza gelê xwe, êş û daxwazên wan ji bo azadî û mayînê.

Helbestvanê Omarê Lalê yek ji wan helbestvanên pêşîn e ku afirîneriya xwe xist xizmeta doza gelê xwe de, helbestên wî bûn beşek ji vê tevgera çandî ya ku di navbera hişyariya neteweyî û afirîneriya edebî de girêdan çêkir, û alîkariya xurtkirina ziman û nasnameyê di hest û hişê civakî de kir.

Helbestvan kurd Omerê Lalê yek ji wan dengên wêjeyî tê hesibandin ku beşdarî dewlemendkirina dîmena helbestê ya kurdî ya nûjen bûye, ji ber ku di tecrûbeya xwe de hestê neteweyî û aliyê mirovî, û her wiha ruhê mîrasê û nîşanên nûjeniyê bi hev re girêdide.

Di serdemeke ku nasname tên qirkirin de, helbesta wî weke çalakiyeke domdar a vejenê, ji bo ziman rûmeta wê û ji bo bîranînê hebûna wê lê vedigerîne, û ji bo mirovan girêdana wan a yekem bi axa xwe re zindî dike.

Helbestvan û nivîskarê Kurd ê navdar Omer Hesen Îsmaîl, bi nasnavê (Rêncber) di sala 1935 ê zayînê ji dayîk û bavek Kurd (Hesen û Lalê), li gundê Qesirdela, dikeve rojhilatê Cizîra Botanê, du kîlometran dûrî qiraxên çemê Dîcle, li hember bajarokê Eyn Dîwerê, di nav malbateke kurdperwer , welatparêz û kedkar girêdayî eşîra Dërşewa , hatiye dinyayê, ku ji çar zarokan pêk dihat: Sê bira, Omer, Mihemed û Xelîl, û xwişkek binavê Meryem.


Li nav jîngehek gundewarî ya resen de mezin bû, ku taybetmendiyên hişmendiya wî ya yekem ava kir û di hundirê wî de girêdanek kûr bi ax û nasnameyê re saz kir.

Her wiha ew di jîngehek dewlemend bi çîrokên gelêrî û mîrateya devkî de mezin bû, ku dapîran şev bi têlên efsaneyan dihûnandin, û stranên folklorî dem li ser têlên hesretê dirawistandin; lewra peyv di hundirê wî de ne wek tîpên bêcan, lê wek jîndarên zindî ku bîra gel hildigirin û li dijî jibîrkirinê li ber xwe didin.

Di encama polîtîkayên zordest ên ku di wê qonaxê de li ser Kurdan dihatin meşandin, bi taybetî piştî şoreşa Şêx Seîd Pîran û Îhsan Nûrî, malbata wî neçar ma ku ber bi herêmên Rojavayê Kurdistanê ve koçber bibe, di destpêkê li gundewarê bajarê Dêrikê li gundê Eyn Dîwerê ku li aliyê başûrê Çemê Dîcleyê dikeve bi cih bûn.

Paşê piştî çend salan berê xwe dide gundê Mezra Xwarê û li Til Xenzîrê Banî "Girê Şêra" bi cih dibe, li wir tevlî dibistana seretayî dibe , lê ji ber xizanî û tengdestiya jiyanê ne karî ku xwendina xwe temam bike, lewra di pola duyemîn de dev ji dibistanê berda û ji bo debara malbata xwe bike.

Di sala 1957'an de bi xanim Gewrê re dizewice û ji ber şert û mercên dijwar ên jiyanê û xirabûna rewşa aborî, malbat tevgerên xwe yên lêgerîna



aramiyê didomîne,ji ber vê yekê di sala 1958'an de dîsa ji gundê Til Xinzîr ber bi gundê Zaxatê koç kirin.,diwazde zarok ji wan re çêdibin: şeş kur (Îsmaîl, Hêşyar, Mêvan, Kadar, Cevîn, Vîndar) û şeş keç (Dîlber, Kûlçin, Bîrevan, Peyman, Dilman, Canê), ew zarok li ser nirxên neteweyî, hezkirina welat û parastina wî hatin mezin kirin, di malbatekê de ku têr bi ruhê girêdana bi ax û peyvê ve.

Bi veguheztina malbatê ber bi gundê Zixatê di sala 1958'an , qonaxeke nû di jiyana helbestvan de dest pê kir, ku di hişmendiya wî ya siyasî û xebata wî ya edebî û çandî de guhertinên girîng pêk anîn, ji ber ku taybetmendiyên hişmendiya neteweyî di kesayetiya wî de dest pê kir û bi hesta berpirsiyariya kûr a li hember gelê xwe û doza wî dest pê kir.

Di heman salê de, ew tevlî refên Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (ElPartî) bû, di demekê de ku destpêkên ya hişmendiya neteweyî bi sînor bû û bi dijwariyan tijî bû.

Ji wê gavê ve, ew girt rêyeke têkoşînê ya dirêj li gel komek bijêr ji tekoşerên pêşeng, wek Kenan Egîd û Ehmed Mela Îbrahîm, û bi hev re xebitîn ji bo belavkirina hişmendiya neteweyî û kurdî di nav gelê kurd de ,ev xebat bû sedem ku çend caran were girtin û zindankirin.

Bi destpêkirina şoreşa rizgarîxwaziya Kurdistanê di sala 1961ê de, gund û mala wî di yek ji naziktirîn qonaxên tekoşîna gelê Kurd de bû penageheke ewle ji bo Pêşmerge û çekdaran. Birayê wî, Mihemed Hesen, yek ji Kurdên Sûriyê yên yekem bû ku tevlî refên Pêşmerge bû û ji bo rizgarkirina Kurdistanê çek hilgirtibû.

Bi destpêkirina şoreşa rizgarîxwaziya Kurdistanê di sala 1961an de, gund û mala wî bûne penagehek ewleh ji bo peşmerge û şoreşgeran, di demeke herî hestiyar û dijwar a têkoşîna kurdî de.

Birayê wî, Mihemed Hesen, yek ji Kurdên Sûriyê yên yekem bû ku tevlî refên Pêşmerge bû û ji bo rizgarkirina Kurdistanê çek hilgirtibû.

Tevî hemû tengavî û çewisandin ku li ser Omerê Lalê dihat kirin, ew ji helwestên xwe paşde venegerî, û bi dilsozî li ser doza xwe ma, û girêdana bi rêbaza Mustafa Barzanî ve ma, û di reftarên xwe yên rojane de ruhê têkoşîn û nasnameyê zindî kir. Her wiha, berdewam bû di nivîsandina helbesta neteweyî de,ya ku wek dengê zindî yê doza gel û nasnameya wî maye.

Omer Lalê helbestên xwe di demekê de nivîsiye ku zimanê kurdî hatibû piştgirîkirin û qedexekirin ji bikaranîna eşkere,û di bin çavdêriyeke tunde de , lewma nivîsandin bû kiryareke berxwedanê û pêdariyê.

Tevî wan şert û mercên dijwar, Omerê Lalê berdewam bû di nivîsandina helbesta kurdî de, û nivîsên neteweyî ku derbirîna Kurdistan, ala û êşa gelê wî dikin pêşkêş dikir , bi vî awayî, helbesta wî bû şahidê êşê û di heman demê de dengek zindî yê nasnameyê û berxwedanê bi peyvê..

Di sala 1958'an de helbesta xwe ya yekem di bin bandora vegera Mistefa Barzanî ya ji Yekîtiya Sovyetê de nivîsiye. Helbesta wî ya yekem îfadeya coşa neteweyî û hêviyeke nû bû.

Ji wê demê ve wî dest bi helbestên netewî û niştimanperwerî kir li gel nivîsandina helbestên evînî û dildarî , ku evîn di gel welat di yek tevnvîseke helbestî de hatiye girêdan û Kurdistan weke hebûneke zindî nîşan dide û mîna evîndarekî diyar dike ku can ji bo wê têne fedakirin.

Wî mîraseke helbestî ya dewlemend li dû xwe hişt ku di pênc dîwanên ku bi zimanê kurdî hatine çapkirin:

-Xem û Sawêr.

-Çar Çira.

-Tewafa Yarê.

-Welat Binase.

-Evîn û Welat.

DîwanaTewafa Yarê yek ji berhemên wî yên herî bi nav û deng e, ji ber ku ew destaneke dirêj bû ku ji hezar û 520 rêzan pêk dihat û tê de behsa erdnîgariya Kurdistanê, çem û çiyayên wê, bi tabloyeke helbestî ku bi hestên hesret û girêdana kûr bi welat tijî .

Her wiha wî reşnivîsên çar dîwanên din li dû xwe hiştine ku nehatine çapkirin, ligel pirtûkek li ser pend û gotinên pêşiyan ên kurdî, û yek jî li ser eşîrên kurd û herêmên wan, ku ji ber nexweşiya wî nehatiye temamkirin.

Omerê Lalê helbesta kevneşopî bi kêşe û rêzbend nivîsandibû û şêwaza nivîsên wî bi zelaliya ziman û dilpakiya hestan, bi hebûna xurt a sembola niştimanperweriyê ve dihatin diyar kirin ,ji helbestên wî yên herî navdar:

-Xem û xeyalê

- Ey lê gulê

-Yarek min heye bi navê jînê .

Gelek helbestên wî bûne beşek ji mîrata hunerî û folklora kurdî, û ji aliyê hunermendên mezin ve, hatine strandin,berî her kesî jî Mihemed Şêxo, ligel Mehmûd Ezîz Şakir, Beha Şêxo, Kenan Şêxo, Seîd Gebarî, Biland Îbrahîm û Şivan Perwer ,her wiha komên folklorî yên Qamişlo û Dêrikê. Bi vî awayî, berhemên wî di bîr û hişê gelê kurd de zindî û mayînde man.

Helbestvan Omar Lalê bi zimanên kurdî û erebî baş dizanî, û li gel berhemên xwe yên helbestî, xwedî rolek çandî ya çalak bû, ew di Kongreya Neteweyî ya Kurdî ya sala 1970'an de li Kurdistanê Iraqê beşdar bû, û her wiha di damezrandina Festîvala Helbestê ya Kurdî li Sûriyê de rolek bingehîn lîst , ku bû qadek girîng ji bo danûstandina çandî û afirîneriya edebî.

Di heman demê de endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê – Şaxê Dihokê bû û ji bo rêzgirtin ji xebatên xwe yên wêjeyî re çendîn xelat û spasname wergirtin , yên herî diyar :

- Xelata Festîvalê (2006)

-Xelata Helbestvan Tîrêj (2006)

-Sipsname di Festîvala Mihemed Şêxo li Hewlerê (2011)

Di sala 1997'an de, ji ber bûyerekê trajîk, ew ji gundê xwe Zaxatê derket û di navbera Mezrî û Mêrga Mîra bi cih bû, berî ku li Şamê bi cih bibe ,li wir, salên dirêj bi feqîrî û dijwarî jiyan kir.

Piştî heft salan berê xwe dide herêma Kurdistanê û li bajarê Zaxoyê bi cih dibe û li wir tevî şert û mercên dijwar jî xebatên xwe yên edebî berdewam dike.

Çalakiya Omerê Lalê tenê bi helbesta kurdî ya klasîk ve sînordar nema, di heman demê de ji bo belgekirina bîra gelêrî jî dirêj bû, ji ber ku wî gotinên pêşiyan ên kurdî berhev kirin û nivîsandin û li ser eşîrên kurd, herêm û gundên wan nivîs û lêkolîn çêkirin, di hewlekê de ji bo parastina mîrata çandî û civakî û parastina nasnameya kurdî ji windabûnê.

Di 6'ê Mijdara 2011'an de, helbestvan Omerê Lalê piştî têkoşînek dirêj bi nexweşiyê re, li bajarokê Rimêlanê, bi bêdengî koça dawî kir û mîraseke helbestî ya zindî li pey xwe hişt. Roja din termê wî ji bajarê Girkê Legê ber bi bajarê wî Dêrikê ve hate birin, bajarê ku jê hez dikir, û li wir di merasîmeke bi heybet ku pêkhateyên cuda yên civakê û aliyên siyasî tê de beşdar bûn, ji bo rêzgirtin li kar û xebata wî û cihê wî di nav wijdana kurdî de, hate veşartin.

Bi çûyîna wî re neteweya Kurd yek ji stûnên helbesta klasîkî û dengekî ku dilsozê rîtma mîras û ruhê nasnameyê mabû winda kir. Helbestvanek ku helbesta bi rêzbend û terazû di demekê tijî guhertinan de hilgirt û ji windabûnê parast ,ew kire pirek di navbera paşeroj û îroyîn de.

Helbestvan Omerê Lalê bi laşê xwe koça dawî kir, lê di dilê gelê xwe û welatê xwe de zindî ma, di bîra civakê de sax ma ku şewqa qet nehatîye vemirandin.

Wî mîraseke edebî ya dewlemend li dû xwe hişt ku bû sedema dewlemendkirina pirtûkxaneya edebî û çandî ya kurdî

Tecrûbeya wî ya helbestî bû nîşanek girîng di rêya helbesta klasîk a kurdî de, û dengêk ku hê jî di hiş û hestên nifşan de dengvedide.

Bi vî rengî Omerê Lalê helbestvanek dimîne ku ne tenê helbest nivîsandiye, lê jiyan kiriye û kiriye dengek ji bo bîranîna kurdî û nebezek qet namire di wijdanê gelê ku di peyvê de welatekî dibîne ku nayê koç kirin.

Ji giyanê wî yê pak û temîz re rûmet û mandarî

Ji mîrateya wî ya têkoşînî û wêjeyî re mayînde û dimdarî.



Remezan Olçen

## Afirandina wateyê

Em di serdemeke wisa de ne ku bajarên mezin bûne girtîgehên ji betonê, polîtîkayên neolîberal her tiştî dikin malê bazarê û mirov gav bi gav veduguhere otomatê. Cîhan di nav qeyraneke kûr a wateyê de ye. Çîrokên ku berê mirovatî li dora êgir dicivandin, îro di bin zexta lezgînî û xerckirinê de pûç dibin. Em êdî nikarin tiştên nû bixwînin, an jî gava em dixwînin, em nikarin li ser kûr bibin. Çand, huner û edebiyat di bin dorpêçeke mezin de ne.

Lê belê, di nîvê vê tariyê de, ronahiyek ji xaka qedîm a Kurdistanê hildibe. Gelê kurd, tevî ku hîna jî di bin hovîtiya sînoran, qedexeyan û polîtîkayên pişaftinê de dinale û ji bo azadiya xwe hîn jî têdikoşe, sîstema alternatîf a jiyanê jî ava dike. Paradigmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê, ne tenê manîfestoyeke siyasî ye; ew di heman demê de şoreşeke ziman, hîskirin û afirandinê ye. Ev felsefe, li hemberî hişmendiya kapîtalîst ku her tiştî mîna makîneyê dibîne, can dide her hevoka ku ji pênûsa nivîskarekî/ê kurd derdikeve.

Di vê sedsalê de, ji bo me kurdan edebiyat ne tenê amûreke estetîk e. Ew qada herî xurt a liberxwedan û afirandina wateyê ye. Gava Cegerxwîn, Feqiyê Teyran an jî dengê şoreşger ê jinê yê îroyîn di helbestekê de zindî dibe, em sînorên betonî yên sîstema modern diçirînin. Çîrok û romanên kurdî yên ku îro têne nivîsandin, neynika jiyaneke nû ne ku tê de jin ne kole ye, xweza ne qada talanê ye û mirov ne otomat e.

"Zimanê me, welatê me yê yekem e. Û gava em bi kurdî xeyalan dikin, em cîhaneke ku kapîtalîzmê her tiştê wê talan kiriye, ji nû ve ava dikin."

Edebiyata kurdî bi helbestê re dibe qêrînek, bi çîrokê re dibe bîreke ku nayê jêbirin. Her hevoka ku li hemberî mekanîkbûna modernîteyê tê rêsandin, tovekî nû ye ku di dilê vî welatî de şîn dibe.

Lê belê, ev hewldana afirandia wateyê nabe ku tenê di navbera du bergên pirtûkan de bimîne. Jiyana nû ya ku em behs dikin, di hevdîtin, nîqaş û çalakiyên çandî de divê geş bibe. Tevî hemû astengî, qedexe û zextên li ser weşangeriya kurdî, weşanxaneyên me îro dibin baregên vê berxwedana hunerî. Bi destek û teşwiqa civakê divê hîn bêhtir giranî bidin hevdîtinên nivîkar û xwendevanan.

Li pirtûkxaneyên Amedê, Qamişlo, Hewlêr, Wanê û Ewropayê û hwd, çalakiyên weşanxaneyan û hevdîtinên nivîskar-xwendevanan, ji sînorên bazarê yên klasîk lazim e derkevin. Ev der ne tenê cihên firotina pirtûkan in; ew qadên komunal in ku tê de felsefeya azadiyê, êş û hêviyên gelê kurd divê bên nîqaşkirin. Gava xwendevanek û nivîskarek li dora maseyekê rûdinên û li ser çîrokeke ku behsa hebûn û êş û azadiyê dike, ew tenê li ser edebiyatê niaxivin; ew "jiyana nû" bi hev re dirêsin. Ev platform, mekanîkbûna ku neolîberalîzmê ferz kiriye parçe dike û têkiliyeke rastîn, bi giyan û bi wate di navbera mirovan de ava dike.

Em ne otomat in, em ne amûrên sîstema kapîtalîst in. Edebiyata kurdî, bi hêza xwe ya felsefî, bi çavkaniya xwe ya ekolojîk û bi pêşengiya jinê, îro li dijî vê qeyrana cîhanî bersiveke herî zindî ye. Ji bo ku em nebên "em nikarin tiştên nû bixwînin", serî hildana herî mezin vegera li çîrokên xwe, li zimanê xwe û li pirtûkxaneyên xwe ye ku bêhna azadiyê jê tê.

# Şaredariya Qamişlo hemleya reşandina dermanên kêzikan a dûman didomîne

Rêveberê Nivîsgeha Tenduristiyê ya Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo Nayif Mihemed destnîşan kir ku armanca wan ji vê hemleyê ew e; Zêdebûna kêzikan sînordar bike û hawîrdoreke saxlem û ewle ji bo niştecihan çêbike.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Wekî beşek ji hewildanên berdewam ji bo parastina tenduristiya giştî û kêmkirina belavbûna kêzikan, Nivîsgeha Tenduristiyê ya Şaredariya Gel a Qamişlo hemleyeke ji bo reşandina dermanên kêzikan li taxên bajarê Qamişlo dabû destpêkirin û heya niha jî berdewam e.

Ev hewildan beşek ji bernameya birêkûpêk a nivîsgehê ye ku armanc dike belavbûna kêzikên firîner sînordar bike, rewşa jîngeh û tenduristiyê baş bike, nemaze di mehên havînê de, dema ku kêzik zêde dibin. Şaredarî bang li gel dike ku di dema reşandina dûman de hevkariyê bikin û rêbernameyên pêwîst bişopînin da ku ewlehiya giştî misoger bikin.

Di vî derbarî de rêvebriya nivîsgeha tenduristiyê ya şaredariya gel a bajarê Qamişlo Nayif Mihemed ji rojanemya me re behsa vê hemleyê kir.

Rêveberê nivîsgeha tenduristiyê ya şaredariya gel a bajarê Qamişlo Nayif Mihemed diyar kir ku ev du mehan in hemleya reşandina dermanê kêzikan a cureya duman destpê kiriye û bi awayekî rojan e derman li kolanan belav dikin û wiha got: “Ji seat 5 û nîv heya seat 6 piştî nîvro em detpbi reşandinê dikin, rojekê li milê rojhilat û roja din li aliyê rojava ye. Heya ku derman li hemû kolanên bajêr bê reşandin, wê hemle berdewam be.

Carnana gilî ji me re tên, li gorî vê yekê jî em diçin wî cihî, em di destpêkê de dişopînin û eger pêsiwtî hebe em derman dirişînin. Hin cih hene weke Cimayê, bazara goşt û meslexa beledî di van her du mehan de me du heya sê caran li van ciyan derman hatiye reşandiye, ji ber ku mêş li van ciyan bi awayekî zêde belav dibin, bi awayî jî li çemê Ceqceq ev xebat hat meşandin.”

### ‘Hemle heya bidawîbûna demsla havînê dê berdewam bike’

Nayif Mihemed destnîşan kir ku carnan kêmasî bi wan re derdikevin an jî carnan erbeyên wan xirab dibin, lê hewildanên wan jî ji bo derbaskirina kêmasiya hene, da ku li tevahiya bajêr û gundan dermanê kêzikan bireşînin û wiha lê zêde kir: “Bi gelemperî me reşandina derman li hemû bajêr bidawî kiriye, niha tenê aliyê rojava maye, di rojên pêş de em ê vî alî jî bi dawî bikin. Herwiha hemleya me heya dawiya demsala havînê wê berdewam bike.

Îsal mêş û kelmêş bi awayekî zêde derketine, ev jî ji ber şilbûna zêde ye herwiha zêdebûna qadên keskayê ye, wekî din ji ber ku di kontereyên çopê de hinekî kombûna çopê hebû. Di vî derbarî de me têkilî bi beşa paqijiyê re jî kiriye û me ji wan xwest ku her cara çopê bar bikin derman li dû xwe ve bireşînin da ku kêzikên wekî mêş û kurmikan bikuje.”

### Ji bo Tûpişkan derman tê belavkirin

Nayif Mihemed bal kişand li ser belavbûna Tûpikşan û dermanê wan û wiha diyar kir: “Ji bo Tûpişkan jî me hemle li ser malpera şaredariyê raghandiye, bi awayekî rojane derman tê belav kirin. Her welatiyek berê xwe dide şaredariyê em derman pêkêşî wan dikin. Di heman demê de jî me derman li hin komînan û mecali-



san belav kiriye da ku welatî li van cihan jî vegerin û derman bidest bixin, wekî din eger di cara yekê de feyde nekir, dikare careke din serlêdana me bikin da ku em derman pêşkêş wan bikin. Bi vî awayî dê xebata me heya dawiya havînî berdewam be.

### Cureyên dermanan

Nayif Mihemed dermanên bal kişand li ser dermanên ku bikar tînin ji bo rê li ber van kêzik û Tûpikan bigirin anî ziman û awayê bikaranîna wan: “Ova Perma heye her pêc santîman bi lîtreyek av re bi awayekî hundirîn tê bikar anîn. Kasper jî heye ji bo ku bêtir encam bê girtin, me îsal bi mazotê re bikar aniye, ew derveyî tê reşandin, ev her du ji bo Tûpişkan e. Herwiha Sîrasrîn a dûman jî tê reşandin, her lîtreyekê em bermîleke mazot re bikar tînin. Lê li nivîseghê em dikin 3 lître bi bermîlekê re, ji bo ku em li kîjan cihî belav bikin encam bê girtin û çi kêzik, mêş û kurmik hebin rê li ber zêdebûna wan bigrin.”

### Zehmetî û pirsgirêk

Rêvebrê Nivîsgeha Tenduristiyê ya Şaredariya Gela a bajarê Qamişlo Nayif Mihemed di dawiya avaftina xwe de bal kişand li ser astengî û zehmetiyê ku li pêşiya wan derdikeve û wiha anî ziman: “Astengiyên ku li hembe me derdikeve ew e gel bi me re ne alîkar e, her ciyekî em derman direşînin gel bertekê xwe li hember dûmanê derdixîn, tevî k utu zirara wê li ser mirovan tune ye jî, berovajî wê rê li ber zêdebûna kêzikan digre û yên hebin jî wan dikuje. Di heman demê de jî li hin taxan jî zarok êrişî eerbeyên belakirina derman dikin û xwe davêjin erebeyan li pêşiya çavên malbatên wan, lê ew nabin alîkar bi me re, lewma li hin cihan niha hemle rawestandiye. Em bi hêvî ne ku gel bi me re alîkar bin da ku xebata me bi awayekî baş bi dawî bibe û hawîrdoreke saxlem û ewle ji wan re peyda bibe.”

# Xebata Gerenîndeya Avê ya bajarê Dêrikê bênavber dewam dike

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Rêveberê Gerenîndeya Avê ya bajarê Dêrikê Mistefa Ehmed diyar kir ku xebatên wan ji bo dabînkirina avê û sererastkirina toreyên wê bênavber dewam dikin. Herwiha Ehmed bang li welatiyan kir ku bi gerenîndeya avê re alîkar bin û avê zêde xerc nekin.**

Av yek ji girîngtirîn xizmetguzariyên bingehîn e ku bi jiyana rojane ya welatiyan ve girêdayî ye, ku berpirsiyariyek mezin dixe ser milê rayedarên peywendîdar da ku berdewamiya pompekirina wê biparêzin û torên wê baştir bikin. Li bajarê Dêrikê, gerenîndeya Avê ji bo çareserkirina pirsgirêkên têkildarî binesaziyê û hewcedariyên zêde yên nifûsê, xebatên xizmetguzarî û projeyên pêwîst didomînin.

Di derbarî xebatên gerenîndeya avê ya bajarê Dêrikê, rêveberê wê Mistefa Ehmed ji Rojnameya me re axivî.



### ‘Barana îsal ji bo bîran çareserî bû’

Mistefa Ehmed da zanîn ku tîmên gerenîndeya avê şev û roj li ser bîrên avê û cenetorên avê digerin da ku rewşa wan kontirol bikin û wiha got: “Di bajarê Dêrikê de 24 bîrên avê hene, beşek ji wan li ser elekitrîka giştî ye heger elekitîra giştî qut bibe, cenetor û enerjiya rojê jî li ser wan heye. Gelek caran elekitrîk ne xurte tabloyên pêxistina bîran pirsgirêk têde çêdibin, lewma tîmên me li ser wan digerin da ku tax nemînin bê av. Salên borî 7 bîrên me mirov dikare bêje hema ji xizmetê derketibûn, 4 ji wan me nîvro û şevan vedimirand da ku av bikeve têde. Barana ku îsal hatî ji van bîrên me re çareseriyek bû, lê heya niha jî nevegeriyana wek berê ji ber ku ava deryayî û ya bin erd ne wek hevin, lê dîsa jî rewşa bîran baştirre ji ber ku li gor lêgerîn û şopandina me heger îsal zûwahî ban wê 10 bîr di bajêr de hatiban sekinandin.”

### ‘Karê gerenîndeya avê her berdewame’

Ehmed axaftinên xwe domandin û wiha got: “Pirojeyên ku niha tên kirin berdewamiya pirojeyên salên borî ne, berî niha me kar kiribû di milê torên avê de di taxa sor, şehîd Cûdî, şehîd Xebat û beşek di taxa sûkê de, ji ber ku baran zêde bariya kar hat sekinandin. Lê niha piştî ku zûwahî çêbûye em berdewam dikin. Li taxa Sor torên avê hemû çîmento bûn û kevin bûbûn lewma me torek nû anî lê me hîn bi torên giştî ve girê nedaye. Niha me dest bi taxa Cûdî kiriye ji nû ve em toran datînin û hin torên kevin hîn hene, me ji welatiyan daxwaz kiriye ku xetên xwe deynin li ser torên nû da ku ew tax bitemamî bidawî bibe. Di taxa Şehîd Xebat de jî beşeke baş jê, kar têde hatiye kirin û me torên nû danîne. Em niha li taxa bawliyan de jî kar dikin û li gor derfetên ku di nav destê me de heyî em kar didin meşandin. Heger îsal ev piroje bidawî nebû sala bê jî em ê berdewam bikin ji ber ku armanca me ew e ku torên gel bi giştî werin veguherandin bi yên nû, da ku pirsgirêkên qutbûn û nepaqij bûna avê nebînin.”

### Pêwîste gel jî destek bide navenda avê

Rêveberê gerenîndeya Avê Mistefa Ehmed axaftinên xwew wiha qedandin: “Di nav pirojeyên me de hene ku em bîrên nû bikolin ji bo bajêr, ji ber ku bajar gelekî fireh bûye ji ber vê yekê di havînan de hinekî astengî derdikeve heya ku av dighêje malên ku nû hatine ava kirin. Heya niha erêkirina pirojeya kolana bîran û çêkirina qazanên avê nehatiye diyar kirin, di heman demê de di nav pirojeyên me yên sala 2026‘an de çêkirina torên avê ji taxên ku nû hatîn avakirin re jî. Heger gelê me bi me re ne alîkar be em nikarin tu pirojeyan pêk bînin, dema tîmên zabîtê derdikevin nava kolanan gel ne razîbûna xwe nîşan didin ku îsal baran zêde bariyaye çima hûn derfetê nadin ku em avê serif bikin. Her kes bi çavê xwe dibînin çiqasî xemsarî di milê serifkirina avê de heye heger em li ser nesekinin wê havînê kêmasî bikeve di milê avê de, ji ber ku torên bajêr bi giştî bi hev ve girêdayî ne, lewma em daxwaz ji gel dikin ku destê xwe deynin li ser wijdanên xwe û xwedî li avê derkeve. Taybetmendiya bajarê Dêrikê ew e ku heya niha wek bajarên din rastî tu astengiyên qutbûna avê nehatiye.”



# Tengava Hurmuzê bû xewnereşka Trumpî!

**Volqal Elî**

Di zimanên cîhanê de xwe sivikkirin rêgezek e. Bi taybetî di zimanên Aryenîk de… Ji ber ku Kurdî jî ji vê malbata çand û zimanan e, dibe ku mînakên herî xweş di zimanê me de hebe. Mînak, di destana Mem û Zîn de ne dûr e ku navê Mem ji Memed hatibe kurtkirin. Lewra hîn îro em Kurd di jiyanê wisa dikin. Evrêgezê ji peyvên biyanî ku ketine zimanê Kurdî jî wekî xwe derbas dibe. Werhasil ji ber ku rasterast ne mijara me ye em zêde pêde naçin. Ji vê bêhtir mijara me şerê ku ev nêzîk 6-7 heyvan e dinya-alem li ser nîqaş dike. Vaye ev, di demên dawiyê de wekî şerê Tengava Hurmuzê tê nîqaş kirin. Ev nav bi xwe navê Ahûra Mazda ye. Bi îhtimalekî mezin ji ber hebûna ola Zerdeştî yan jî olên qedîmtir li vê herêmê, (Ahûra Mazda ji ber ku navekî hîn qedîmtir e) ev nav li vê kendavê hatiye kirin. Lê bi demê re hatiye guherîn û bûye Hurmuz.  Ev bi xwe mijareke dîrokî ya dûr û dirêj a lêkolînê ye. Hurmuz ji bilî ku navekî qedîm ê wisa ye di van demên dawiyê de ji şerekî xwînavî re jî malovanî dike.

Hewldana dîzaykirina cîhanê, piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî ya Rûsyaya Sowyetê bi fîilî ketiye meriyetê. Di ser re çend sal nebibûn, hêzên hegemon bi pêşengiya  Amerîkayê (di salên 1990’î de) dest li Rojhilata Navîn werda. Hema bêje ev şerê cîhanê yê sêyemîn ku li sih salî derbas kiriye, herî dawî ji xwe re Îran kire hedef; lê ji ber hesabên cuda, Trumpî ji Îsraîlê jî dev berda û çû li Swîsreyê bi rejîma meleyên Îranê re peymana aştiyê çêkir.

Di vê de hesabê Trump çi bû? Ji bo fêmkirina vê, divê mirov li nîqaşên ji beriya şerê ku îsal dest pê kiribû vegere. Ji beriya şer dest pê bike, analîzên girîng hebûn ku digotin Trumpî rîskê vî şerî naxe sukra xwe. Ji ber ku di dawiya îsal de hilbijartinên navberê li DYE’ê çêdibin û di rewşeke  neyînî ya şer de desthilata Partiya Komarger dê bikeve xetereyê. Lê di encamê de ji ber hin sedeman wisa nebû. Dinya di roj û şevekê de bû topeke ji agir, kêm mabû seneryoyên qiyameta bombeya atomê rast derkevin. Lê bêlê hîn jî nayê zanîn ku Trûmpî çima ev rîsk girt. Herî kêm ji me ve nexuya ye ku çi tişt bû sedema vê. Lê çend tiştên ji beriya vî şerî û hema di destpêkê de çêbûne, dibe ku dilê wî bijandibe vî şerî. Ya yekê, kowboyên Trumpî, serokê Venezuela Maduroyê dostê Tayyıp Eroğan ji nav cihê wî rakirin birin. Ya duyemîn, hîn di destpêka şer de kuştina Elî Xemeney hişê Trumpî ji serê wî bir. Ya destpêkê ji ber sedemên aborî yên li DYE di serî de piraniya civaka vî welatî, dest pê kirin li dijî şer derkevin. Heta alîgirên Partiya Komarger, endamên her du meclisan ê partiyê  bi şer nexweş bûn. Dîsa dirêjbûna şer, hesabên Trump şaş dane derxistin. Dema ku hesabên dawî şaş derketin, ji neçarî Trumpî li xwe werqilî.

Lê çi dibe bila bibe, ev ‘peymana aştiyê’ dê bibe destpêka şerekî mezin. Ev, ne texmîn yan jî tehlîleke reşbîn e. Xwezaya hêzên hegemon ev e. Di her tevgera xwe de ji sedî sed xwe li serkeftin yan jî raseriyeke bêyî şîrîk radikêşin. Bi taybetî hêzeke wekî DYE ku pêşengê modernîteya resmaliyetê ye wisa ye. Wateya vê çi ye? Yanî ti luks yan jî serbestiya Trumpî tine ku ji binî de ji vî şerî vekişe û li Qesra Spî xwe vezilîne! Ya rast pirsgirêk ne tenê ya Trumpî ye jî. Em bihesibînin ku wisa bû. Wê demê Îran ku çengekî cuda yê şaristaniya kedxwar e li cîhanê û ya herî girîng jî li herêma Rojhilata Navîn ti rehetiyê nade DYE û Îsraîlê. Dibe ku wekî dewlet pir zêde pirsirêkek hebûnê ya DYE dernekeve lê ev ewlekariya Îsraîl dixe xetereyê. Heta pirsgirêka wê ya ontolojîk (hebûn) rû dide. Eger ev îhtimal bi pêş bikeve (mayendebûna aştiya DYE’ê û Îranê) rewşa DYE’ê ji Îsraîlê ne kêm kembaxtir dibe. Çima? Amerîkayek ku li beramberî rejîma Îranê têkçûyî nikare pêşengiya modernîteya kapîtalîst bike! Kês pê bawer nake. Giraniya wê namîne! Ev ji niha de xuyaye. Mînak, di civîna G-7 a li Ewrûpayê de nîqaşa di navbera serokwezîra Îtalya de îşareta vê ye. Stiya Melonî rasterast kûjeriya DYE’e da rûyê Trumpî ku cara yekemîn Amerîka çekên atomî bi kar aniye. Nîqaşên wisa timî naqewimin. Ya din Colaniyê ku taca melîktiyê bi saya serê Trumpî danî serê xwe, talîmata wî red kir û got Sûriyê li dijî Hizbulahê nakeve şer. Ev mijar hîn bi temamî ne zelal jî be, herî kêm wî (Colanî) ew hêz bi xwe re dît ku vê seknê li beramberê Trumpî (DYE) nîşan bide.

Di encamê de hem aştî û hem jî şerê Trumpî wekî şûrekî du aliyên wî birra ye. Çi bike jî dê ev şûr derbeyeke kujer lê bide. Derb ne tenê li Trumpî ye; li hegemonyaya DYE’ê ye’. Tenê riyeke derketinê ji bo Trumpî heye; bêyî ku demê derbas bike li dijî Îran dest bi şer bike û di vî şerî de jî bi ser bive! Naxwe Partiya Komarger di hilbijtinên navberê de dê hêzeke mezin wenda bike; bi vê jî nemîne hegemonyaya DYE bikeve xetereyê!

# Hevkêşeya hêzê ya nû li Rojhilata Navîn

**Botan Amed**

Rageşiyên leşkerî û siyasî yên di navbera Îran, Îsraîl û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de ku di sala 2025’an de zêde dibin, divê ne tenê wekî pevçûnek di navbera van her sê dewletan de werin dîtin. Lêkolînek li ser veguherînên ku Rojhilata Navîn di sedsala dawî de derbas kiriye nîşan dide ku hema hema her şerekî mezin ê li herêmê rasterast ne tenê bandorê li dewletên têkildar dike, lê di heman demê de bandorê li nifûsên marjînalîzekirî, civakên mezhebî û hevsengiyên hêza herêmî jî dike. Ji ber vê yekê, bandorên şerên wiha li gelek deveran, ji korîdorên enerjiyê û bazirganiya navneteweyî bigire heya têkiliyên dîplomatîk, mîmariya ewlehiyê, jiyana civakî û têkoşînên nasnameyê, dirêj dibin. Pevçûnên leşkerî yên rasterast ên di navbera Îran û Îsraîlê de, û tevlêbûna Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di astên cûda de, nîşan didin ku pêşbaziya li Rojhilata Navîn, ku demek dirêj bi rêya “şerên wekîlan” tê meşandin, ketiye qonaxek nû. Êrîşên mûşekî yên dûr-menzîl, operasyonên hewayî û operasyonên ku binesaziya krîtîk hedef digirin eşkere kirine ku şer êdî ne tenê bi eniyên taybetî ve sînorkirî ye, lê veguheriye krîzek ewlehiyê ya pir-qatî ku bandorê li tevahiya herêmê dike. Lêbelê, wekî her dem, sivîl berdêla herî giran didin. Armancgirtina wargehan, rastîya ku bi mîlyonan mirov neçar in ku di nezelaliyê de bijîn, kûrbûna krîzên aborî, û zehmetiya gihîştina pêdiviyên bingehîn ên mirovan nîşan didin ku şer ne tenê wêraniya leşkerî, lê di heman demê de wêraniya civakî jî çêdike. Dîrokê bi berdewamî nîşan daye ku encamên herî giran ên têkoşînên ku ji hêla hêzên mezin ve têne meşandin pir caran ji hêla gel ve têne kişandin, ne ji hêla dewletan bi xwe ve. Di vê hevkêşeya tevlihev de, gelê Kurd careke din di têkoşînên desthilatdariyê yên navneteweyî de bûye mijarek girîng. Ji ber ku nifûsa Kurd li seranserê Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyeyê belav bûye, her guherînek stratejîk a li herêmê rasterast an nerasterast bandorê li siyaseta Kurd dike. Lêbelê, yek ji aliyên girîng ên di vê serdema dawî de helwesta derdorên siyasî yên Kurd e ku ne bibin aliyek rasterast di şerê herêmî de. Ev nêzîkatî wekî “rêya sêyemîn” tê pênase kirin; ango, ew dikare wekî pêşîniya ewlehiya civaka xwe û parastina destkeftiyên xwe yên heyî bêyî ku bibin beşek ji eksena Îranî an eksena Îsraîl-Amerîka were şîrove kirin. Ev perspektîf li ser ezmûnên ku ji şerên berê yên li Rojhilata Navîn hatine fêr kirin hatiye damezrandin. Di demên berê de, Rojava, ku ji hêla hêzên herêmî û cîhanî ve dihat piştgirî kirin, dema ku hevsengiya hêzê guherî, bi tenê ma; Ew rastiyek e ku gelê Kurd piştî şer bedelên herî giran da. Ji ber vê yekê, rast e ku beşdarbûna rasterast di pêşbaziya di navbera dewletan de xetereyên demdirêj hildigire, di heman demê de parastina kapasîteya biryardana xweser stratejiyek domdartir e. Ji aliyekî din ve, ne mimkun e ku mirov bibêje ku ev nêzîkatî ji hêla hemî aktorên siyasî yên Kurd ve bi heman rengî tê pejirandin. Tevgera siyasî ya Kurd a ku li Başûrê Kurdistanê dixebite dikare ji ber şert û mercên qanûnî, ewlehî û siyasî yên ku ew tê de ne polîtîkayên cûda ji partiyên din ên Kurd bişopîne. Derketina holê ya înîsiyatîfên agirbestê di qonaxên paşîn ên şer de nîşan da ku kanalên dîplomatîk bi tevahî nehatine girtin. Lêbelê, êrîş û tawanbarkirinên hevbeş ên ku dem bi dem tevî daxuyaniyên agirbestê berdewam kirin jî cûdahiya di navbera rastiya leşkerî ya li ser erdê û retorîka dîplomatîk de eşkere dikin. Di wêjeya têkiliyên navneteweyî de , ev rewş dikare wekî hewldana aliyan were ravekirin ku dema danûstandinan dikin, hêza xwe ya danûstandinê li ser erdê zêde dikin. Ji ber vê yekê, pêvajoyên agirbestê ne tenê wekî rawestandina pevçûnan, lê di heman demê de wekî beşek girîng a danûstandinan têne hesibandin ku armanc dikin şert û mercên rêziknameya siyasî ya ku dê piştî şer derkeve holê diyar bikin.

# Sûriyê; Her derengketinek di peydakirina çareseriyê de wê lêçûna hilweşînê girantir bike

Kirîza Sûriyê gihîştiye astek ku êdî nikare înkar an paşxistinê tehemûl bike, her derengketinek di çareseriyê de, wê lêçûna hilweşînê hem ji bo civakê û hem jî ji bo dewletê zêde bike. Ji ber wê pêwîst e hikumeta demkî bikeve ferqê ku bêyî demokrasî, nenavendîbûn, edalet û wekheviyê wê tu çareserî neyê peydakirin.

**Şaho Xanim**

Piştî rûxandina Rêjîma Bassê, HTŞ'ê bi serkirdetiya Ehmed Alşeri xwe li ser desthlatdariya Sûriyê feriz kir û wekî hikumeteke demkî desthilatdariya xwe ragihand. Bi tena xwe bêyî beşdariya gelên Sûriyê Meclisa Gel û hikumeta xwe ya demkî ava kir.

Bi destekdayîna Tirkiyê, Qeter, Erebistana Sûdî, Birîtaniya û DYA'yê, hikumeta Şeri di ware diplomasî de dest bi liv û tevgerê kir û hewil da ku di qada navneteweyî de hikumeta demkî bê qebûlkirin û desthlatdariya wê bi hêz bibe. Di tevahiya civîn û gotinên rayedarên hikumeta demkî de herdem tekezî li ser avakirina Sûriyeke nû a bihêz, edalet û darizandina kesên ku destê wean di rijandina xwîna gelê Sûriyê de heye dihat kirin. Bi taybet di milê aborî de rojane behsa pirojeyên aborî û kompaniyên cîhanî ku wê cihê xwe di Sûriyê bigrin û kar bikin, dihat kirin.

Lê tişta ku li ser erdê qewmî û heta niha jî didome berovajî axaftinên rayedarên hikumeta demkî a Sûriyê ye.

Rojane li Hums, Hema, berava Sûriyê û Şamê sûcên dijmirovî tên kirin. Mirov têne revandin û kuştin, bi taybet li ser gelê Elewî siyaseta qirkinê û çewisandinê tê meşandin. Li Dêra Zorê û Reqa jî tevliheviyeke ewlehiyê ya mezin rû daye. Dizî û şilandin bûye pirsgirêke mezin ku aramiya mirovan dixe xeteriyê.

Ev rastiyên li ser erdê bê guman îspat dikin ku nêzîkatiya ewlehiyê ya heyî, ku ji hêla Ehmed El-Şaraa û dezgeha qaşo "Ewlehiya Giştî" ve tê temsîl kirin, ne tenê li paytext Şamê, lê li seranserê Sûriyeyê, jêhatîbûn û stratejiya berfireh ji bo sepandina serweriya qanûnê û vegerandina aramiyê tune ye.

Veguhestina ji serdema rejîma berê avakirina saziyên neteweyî yên berfireh ji bo parastina welatiyan pêwîst kir, ne ji nû ve hilberandina desthilatdariyek ku nikare valahiya ewlehiyê kontrol bike û civakê wekî rehîn ji navendên hêzê yên alternatîf re bihêle.

Di derbarê rewşa Ewlhiyê li Sûriyê Cîgirê Nûnerê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî li Sûriyê, Claudio Cordone, diyar kiribû ku pêvajoya veguhestina siyasî li welêt di "qonaxek krîtîk de ye ku hem bi derfetan û hem jî bi qelsiyê ve tête diyar kirin." Wî zêde kir ku NY hewlên xwe li ser piştgiriya rayedar û gel di rûbirûbûna pirsgirêkên heyî de û xebata ber bi "paşerojek serwer, aram, aştiyane û berfireh" de disekine. Cordone tekez kir ku pêdivî ye ku pêvajoya veguheztina siyasî li Sûriyeyê bi avakirina desthilata qanûndanînê, xurtkirina saziyên dewletê û avakirina serdestiya qanûnê pêşve biçe.

### Hikumeta ku tu sozên xwe pêknayîne; Vegera koçberên Serêkaniyê û berdana ava Elok

Piştî imzekirina peymana 29'ê Çileyê di navbera hikumeta demkî û QSD'ê de, yek ji xalên peymanê yên bingehîn vegera koçberên Efrîn û Serêkaniyê bû. Rayedarên hikumeta demkî bi dehê caran gotin ku di demeke nêz de wê koçber li bajarê xwe vegerin, lê tişta li ser erdê dibe berovajî gotinên wan in. Heta astekê erênî koçberên Efrînê bi çend kerwanan vegeriyan li ser malên xwe, lê heta niha gelek mal di destê malbatên komên çekdar yên bi ser Tirkiyê û hikumeta Şeri de û ew qebûl nakin ku malên Efrîniyan vala bikin. Li aliyê din jî hîn jib o vegera koçberên Serêkaniyê tu gav nehatine avêtin.

Çekdarên li Serêkaniyê rojane gefan li Koçberên Serêkaniyê dixwin û dibêjin ew qebûl nakin ku gel veger malên xwe. Ev yek Hikûmeta Demkî dixe cihê berpirsiyariyê de. Ji destpêka hatina hikumeta Şeri ve, rayedarên hikumetê soz didin ku ew ê ava Elok ku ji aliyê dewleta Tirk ve li ser Hesekê hatibû qutkirin, ji nû ve bixin xizmetê û ev rewş bê çareserkirin. Lêbelê, rastiya li ser erdê van gotinên wan red dike û niştecihên bajêr dixe pêş aliyekî din ku ne xêra wan dixwaze û ne jî avê ji bo wan dixwaze.

### Rewşa Aborî

Li Sûriyê roj bi roj piştî hatina hikumeta demkî krîza jiyanê her ku diçe xirabtir dibe, berfirehbûneke bêhempa ya xizanî rû dide, hêza kirîna welatiyan tê diçe. Ev di demekê de diqewime ku xizmetên bingehîn û derfetên jiyaneke baş kêm dibin, hesta giştî ya bêhêvîtî ya gelên Sûriyê zêde dibe.

Li şûna ku hikumeta demkî bare gel sivik bike û li çareseriyê bigre, îroj elektirîk, sotemenî û xizmetên bingehîn kêm dik. Li hemberî wê jî gel bi xepêşandanan nerazîbûna xwe nîşan dide. Ji xwe xwepêşandanên dawî li Qamilo û Hesekê tekez dike ku êdî gel vê rewşa xweab a borî û xizmetguzarî nema qebûl dike. Eger ku çareserî neyê dîtin dibe ku di demên nêz de li dijî hikumeta demkî serhildanên giştî bên lidarxistin û rewşa Sûriyê ber bi pêvajoyeke ne diyar ve biçe.




Rasteyeke li ber çavan e, tiştê ku îro Sûriyê tê jiyîn ne tenê krîzeke aborî ya derbasbûyî ye, lê belê encameke rasterast a avahiyeke siyasî ya girtî û nekarîna berdewam a çêkirina reformên rastîn di rêveberiya dewlet û aboriyê de ye. Ev yek welat kiriye dîlê polîtîkayên perçiqandinê ên li ser bingeha yekdestdariyê, pêşanî dayîna berjewendiyên teng, marjînalîzekirina kesên jêhatî û dûrxistina civakê ji beşdarbûna di diyarkirina çarenûsa welêt de. Ji xwe berdewamiya vê nêzîkatiyê hilweşînê girantir dike, tiştê ku ji bingehên berxwedana civakî maye xera dike û bêtir Sûriyan ber bi koçberiyê an jî xerabûnê ve dibe, bi vî rengî tehdît li ser tevna neteweyî dike û dabeşbûnên civakî kûrtir dike.

Li Sûriyê eşkere bûye ku ti çareseriyeke aborî nikare bi ser bikeve bêyî reformên siyasî yên cidî ku vegerandina saziyan garantî bike, hawîrdorek qanûnî ya zelal ava bike û dawî li gendelî û bêcezatiyê bîne. Aboriyeke saxlem dewletek ku bi serweriya qanûnê û baweriya giştî tê rêvebirin hewce dike, ku bêyî beşdariya siyasî ya rastîn û garantiyên hemwelatîbûna wekhev nayê avakirin.

### Çareserî

Krîza Sûriyê gihîştiye astek ku êdî nikare înkar an paşxistinê tehemûl bike û her derengketinek di destpêkirina reformên bingehîn de dê lêçûna hilweşînê hem ji bo civakê û hem jî ji bo dewletê zêde bike. Sûriye îro hewceyê îradeyek neteweyî ya yekgirtî ye ku wateya dewletê wekî çarçoveyek ji bo hemwelatîbûn û edaletê vegerîne, ne amûrek serdestî û dûrxistinê; û projeyek neteweyî ya nû ku siyasetê bi civakê, aboriyê bi edaletê û dewletê bi gelê xwe ve girêdide.

Eger hikumeta demk rastîn li çareseriyê bigre divê pêvajoyek reforma siyasî ya berfireh ku rê li ber hemî Sûriyan vedike da ku beşdarî şekildana pêşeroja welatê xwe bibin, dimildest bide destpêkirin. Pê re ji nû ve avakirina saziyên dewletê li ser bingehên hemwelatîbûn, jêhatîbûn û serxwebûnê, bêyî serdestiya hêz û navendên bandore bixe dewrê. Herwiha polîtîkayên aborî yên dadperwer û zelal ku çavkaniyan ber bi sektorên hilberîner û xizmetên bingehîn veguhezînin, pêk bîne. Planên parastina civakî yên lezgîn ji komên herî xeternak bide destpêkirin. Pêwîste li dijî gendeliya avahîsaziyê ku yek ji sedemên herî girîng ên hilweşîna aborî û astengkirina pêşveçûnê ye, têkoşîneke cidî bê kirin. Ji xwe afirandina jîngeha neteweyî ya pêwîst ji bo çareseriyek siyasî ya berfireh û domdar dikare dawî li pevçûn û parçebûnê bîne.

### Sûriya nû ku gel dixwazin wê ava bikin

Krîza heyî ne tenê aborî ye; ew encama nebûna beşdariya rastîn di biryardanê de û nebûna modelek demokratîk e ku mafên hemî Sûriyan garantî dike. Pêşeroja Sûriyeyê divê li ser demokrasiyê, nenavendîbûnê, edaletê û hemwelatîbûna wekhev were avakirin, da ku hemî herêm û civak beşdarî rêvebirina karûbarên xwe û şekildana paşeroja xwe bibin. Têkoşîna demokratîk a aştiyane ne vebijarkek demkî ye, lê rêyek dirêj e ber bi dewletek ku rêzê li mirovan digire û maf û azadiyan diparêze. Sûriyeya nû ne li ser cudakariyê, lê li ser hevkariyê ava dibe.

## Siyaseta meşandina kirîzê ya bikontrol!



Pêjder Altan

Rûxmê hemû astengî, operasyonên hişmendî, kaos û krîzên siyasî, pêvajoya "Aştî û Civaka Demokratîk" a ji aliyê Rêber Apo ve hatiye destpêkirin, berdewam dike. Qaşo hikumeta AKP-MHP'ê dê ji bo gavavêtinê di meha Hezîranê de Parlementoya Tirkiyê de hin madeyên zagonan derxistibûya. Lê derneket û wek e hincet jî li benda encama ji şerê Îran, Amerîka û Îsraîlê derkeve nîşan dan. Dema mirov li van hemû geşedanan dinêre, xuya dibe ku desthiladariya dewleta Tirk ne di lêgerînek aştiyê ya rast de ye. Stratejiyek tasfiye û kontrolekî ku bi demê re hatiye hiştin dimeşîne. Ango pirsgirêka Kurd ne ji bo çareseriyê, berovajî her tim ji bo birêvebirinê di bin nav "Pêvajoyê" de dizivrîne. Armanca vê aqilê jî ew e ku têkoşîna civakekê ya ku bi înkar û îmhayê nikaribû xilas bike, evcar bi operasyonên hişmendî, westakirin û nediyarbûnê lawaz bike.

Li Tirkiye û Bakûrê Kurdistanê jî û li Sûriye û Rojavayê Kurdistanê heman stratejî û aqilê dixwaze bide meşandin. Niha li Başûrê Kurdistanê jî lê bi versiyonek cuda bixe meriyetê. Li ser maseyê peyamên diyalogê didin lê di qadê de zext û xapandin berdewam dikin; ji aliyekê ve derdikevin ragihandinan de gotinên çareseriyê bikar tînin an jî didin bikaranîn, ji aliyê din ve jî siyasetmedarên Kurd hedef tên girtin, kayuman davêjin ser şaredariyan, hemû dengên muxalif krîmînalîze dikin, li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê jî komên çeteyan ên tarî komên kontra tên avakirin. Ev, wêneyek dûrûtî ya bi organîze ye.

Her wiha ji van armancan a sereke jî, temsiliyet û meşruiyeta civakî ya Tevgera Azadî tune bikin. Vê yekî li Bakur bi riya derxistina pêş hin kesayet û Huda Par, li Başûr û Rojhilat PDK, li Rojavayê Kurdistanê jî bi riya hin kesayet û ENKS'ê bikin. Ji ber ku dewleta Tirk dizane ev mijar tenê ne pêvçûnek çekdarî ye, di heman demî de meseleyek nasname, bîr û bawerî, îrade û dîrokê ye. Lewra li ser çapemeniyê şerekî derûnî ya sîstematîk dimeşînin. Rojek wek Tevgera Apoyî û Rêber Apo wek e ku "dawî lê hatibe" pêşkeş dikin, roja din jî "israra Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ya demokrasî û aştiyê wek e xeteriyek mezin a welat" nîşan didin. Ev propagandaya ku nakok xûya dike, di esasê xwe de ji heman armancî re xizmet dike; civakê manîpule bike û îradeya gelê Kurd bi tenê bihêle.

Her tim vê pêvajoya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye destpêkirin û pêve girêdayê pêkanîna Hevpeymana 29'ê Çileyê ya navbêra Rêveberiya Xweser a Rojava û Hikumeta Demkî ya Şamê dirêjkirin an jî taloqkirin, ne tesadufî ye. Ji ber nezelalî, ne diyarbûn di destê desthiladariyê de her tim wek amûrek kêrhatî ye. Lewra her pirsgirêka nehatî çareserkirin, di dema krîzan de jinûve dikare bike amûreke siyasî. Bi salane vê yekî dikin.

Ger bi rastî jî xwestibûna vê pirsgirêkê çareser kiribûna, hem li Bakur û hem jî li Rojavayê Kurdistanê mafê herî xwezayî perwerdeya zimanê dayikê nedixistin nîqaşê, dê îradeya hilbijêr nehatibûya xespkirin, daxwazên milyonan însanan di bin navê ewlekariyê de asê nekiribûna.

Dewleta Tirk bi salane li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê û di demên dawî de jî li Sûriye û Rojavayê Kurdistanê vê aqilê dimeşîne; "Pirsgirêkê bi tevahî çareser neke, bi temamî jî xilas neke, an go bi awayekê bikontrol bidomîne". Lewra gengeşî çiqas dom bike dê siyaseta ewlehiyê mezin bibe, pêre jî wê siyaseta tirsê zindî were hiştin; ji bo vê jî wê civak parçe bibe û rêveberina wê hêsan bibe.



# Têkoşîna Şêx Seîd heta îro jî tê jiyîn

Di 29'ê Hizêrana 1925'an de, Şêx Seîd û 47 hevalên wî ji aliyê dewleta Tirk ve li Qada Deriyê Çiyê ya Amedê hatin bidarvekirin. Tevî derbasbûna 101 salan di ser şehadeta Şêx Seîd û hevalên wî re, têkoşîna ku dabû destpêkirin, heta roja îro jî tê jiyîn.

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

Li dijî siyaseta inkar û qirkirinê ya ku li ser gelê Kurd dihat meşandin, Serhildana Şêx Seîd serhildana yekemîn bû ku piştî ragihandina sînorên "Komara Tirkiyeyê" bi serokatiya Mustefa Kemal Ataturk, li Kurdistanê dest pê kir.

Lê piştî têkçûna serhildanê û girtina Şîx Seîd û hevalên wî, di 29'ê Hezîrana 1925'an de dadgeha leşkerî ya dewleta Tirk a dagiker Şêx Seyîd û 47 hevalên wî ku pêşengên serhildanê bûn, li ber Deriyê Çiyê yê Amedê bi dar ve kirin.



### Kurtejiyana Şêx Seîd

Ew Seîd kurê Şêx Mehmûdê kurê Şêx Elî ye, ku di sala 1865'an de li navçeya Paloyê li Bakurê Kurdistana ji dayik bûye.

Wî perwerdehiya xwe ya destpêkê ji bavê xwe Şêx Mehmûd wergirt û fêrî jiberkirina Quranê û bingehên xwendin û nivîsandinê bû. Piştre wî fiqih û hiqûqa îslamî xwend.

Piştî qedandina xwendina xwe ew bû zanyarekî olî yê navdar û her wiha piştî mirina bavê wî serokatiya olî xist destê wî û ew kir rêberê sufiyan li Paloyê.

### Çalakiya wî ya siyasî

Şêx Seîd tevlî damezrandina komele û rêxistinên Kurdî di navbera salên 1908'an û 1923'an de bû. Ji bilî serokên Kurd ên serdema xwe, têkiliyên wî yên nêzîk bi malbatên neteweyî yên wekî malbata Bedirxan û malbata Şêx Ubeydullah el-Nehrî re jî hebûn.

Piştî girtina hin serokên Komeleya Azadî Xalid Cebran û Yûsif Ziya di sala 1924'an de, komeleyê li bajarê Helebê ya li Sûriyeyê konferansek lidar xist û Şêx Seîd wekî serokê komeleyê hate hilbijartin û wan biryar da ku serhildanek berfireh ji bo vegerandina mafên neteweyî yên Kurdan pêk bînin.

Destpêka serhildanê ji bo cejna neteweyî ya Kurdan "Newroz", 21'ê Adara 1925'an de, hatibû destnîşankirin û Şêx Seyîd ji bo bidestxistina piştgirîyê ji bo serhildanê li seranserê Kurdistanê geriya.

### Serhildana Şêx Seîd

Serhildana Şêx Seîd Pîran di Sibata 1925'an de dest pê kir, dema ku hêrsa gel li herêmên Amed, Mûş û Çewlikê gur bû, ku piştî kiryarên hikûmeta Tirkiyê sînordarkirinên tund li ser pratîkên olî ferz kirin, dibistanên olî girtin û dadgehên Şerîetê betal kirin, wekî beşek ji tevgera Ataturk ber bi sekularîzma hişk ve, di heman demê de welat bi tevahî lisersekinî kirin û nasnameya pêkhateyên din ji holê rakirin.

Şêx Seîdê Pîran, zanyarekî olî û serokê eşîrê bi bandor bû ku banga berxwedanê li dijî van polîtîkayan kir û bi hezaran şervanên Kurd tevlî serhildanê bûn. Hêzên wî gelek bajar û bajarokên rojhilatê Anatoliyê kontrol kirin ku nêzîkî Dîyarbekirê bûn, ev yek jî hikûmeta Enqerê xist nav fikaran.

Desthilatdarên Tirk bi tundiyeke zêde bersiv dan serhildanê, rewşa awarte îlan kirin, yekîneyên artêşê ji bo dorpêçkirina serhildêran bi cih kirin û cara yekem hêza hewayî bikar anîn da ku tevgereke navxweyî bitepisînin.

Piştî şerên dijwar Şêx Seîd û 47'hevalên wî hatin girtin û birin ber Dadgeha Serxwebûnê ya Şarkê li Amedê ya li Qada Deriyê Çiyê û cezayê darvekirinê li wan birîn û wan bidarve kirin.

Piştî ku serhildana Şêx Seîd bi dawî bû, bandorên li ser herêmên kurdan li Sûriyayê eşkere û xuya bûn. Serhildanên li dijî Kemalîstan pêkhatin, di nav de damezrandina komeleya Xweybûn li Libnanê di sala 1927'an de, bandorek mezin li ser rewşa Kurdên Sûriyê kir. Her weha beşdarbûn û destekdayina ji bo serhildana Agrîyê sala 1930'î de, bandorek mezin li qada Kurdên Sûriyê kir. Ji Bakur koçberiyek ber bi Rojava û Sûriyê ve çêbû. Gelek Rewşenbîr, Serokeşîrên welatparêz û kadroyên siyasî hatin Sûriyê û rolek beriz di hişyarbûna netewî ya kurdên li jêr desthilatdariya ferensî de lîstin.

### Darvekirina Şêx Seîd

Di 29'ê Pûşpera sala 1925'an de Şêx Seyîd di temenê xwe yê 60 salî de şehîd bû.

Berî ku Şêx Seîd bê darvekirin wiha got: "Jiyana min a normal ber bi dawiyê ve diçe. Min xwe ji bo gelê xwe feda kir û ez nepoşman im. Em kêfxweş in ku neviyên me dê li ber dijminan ji me şerim nekin". lê heya îro jî navê wî weke sembola berxwedana Kurd û olî li dijî desthilatdariyeke navendî ku nerazîbûn qebûl nedikir ma.

Ji wê rojê heta îro, dewleta Tirk goristanên Şêx Seîd û hevalên wî veşartî hiştîne û naxwaze cihê goristanan eşkere bike.

# 'Bilindbûna buhayê sotemeniyê barê me duqat giran kiriye'

**Aryan Hesen/Qamişlo**

**Ajokar û şêniyên Qamişlo destnîşan kirin ku ji ber bilindbûna buhayê sotemenî û pêdiviyên jiyanê, ew bi zehmetiyan re rû bi rû ne û wiha gotin: "Em daxwaz dikin ku buhayê sotemenî û pêdiviyên jiyanî weke berê bimînin."**

Sûriyê di dema rêjîma Baas de di rewşa jiyanî ya xerab re derbas dibû, xizmetguzarî tune bû diheman demê de sotemenî û pêdiviyên jiyanê yên sereke gelek buha bûn. Gelê Sûriyê di nava krîza aborî û kêm derfetan de jiyan dikirin. Li beramberî wê Rêveberiya Xweser karîbû ku li herêmên xwe li gorî derfetên gel buhaya guncaw daynin.

Di 8'ê kanûna 2024'an de rêjîma baas hete rûxandin û li şûna wê hikumeta demkî a Sûriyê hat ser desthilatdariyê. Gelê Sûriyê bi rûxandina rêjîma Baas û hatine hikumetek nû gelek hêvî dikirin bi taybet di milê xizmetguzarî û jiyanî de. Lê mixabin hêviya gelê Sûriyê pêk nehat, rewşa jiyanî û pirsgirêka buhayê sotemenî û pêdiviyan hîn kûrtir bû. Di heman demê de krîza aborî hîn zêdetir bû.

Ev rewş piştî peymana 29'ê Çileyê a di navbera hikumeta demkî û Rêveberiya Xweser li herêmê Cîzîr û Kobanî jî hate dîtin, hikumeta demkî di bin gotina pêwîste hemû buhayên sotemenî û kelûpelan li tevahî Sûriyê bibe yek buhayê her tiştî li van herêman zêde kir. Ev yek jî neqebûlkirineke mezin di nava gel û ajokaran de derxist. Herwiha gel daxwaza vegerandina buhayan weke berê dike.

Li tevahî Sûriyê rewşek bi vî awayî tê jiyankirin, ji ber nebûna derfetan û mûçeyên kêm gelê Sûriyê rojane dadikevin kolanan û xwepêşandanan lidardixin û hêvî dikin ku rewşa wan a jiyanê baş bibe, li beramberî wê kesên têkildar bersiva vî gelî nadin û nabin û tu çareserî nayê dîtin.

Di vê çarçoveyê de Serokê Yekîtiya Ajokaran ya Qamişlo, ajokar û şêniyên Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.

### 'Em dixwazin xizmeta gel bikin, lê derfetên me gelek kêmin'

Serokê Yekîtiya Ajokaran ya Qamişlo Necmedîn Osmen diyar kir ku ajokar ji ber bûhayê sûtemeniyê zehmetiyan dibînin û wiha got: "Ji bo kêmkirina buhayê benzînê, ku gihîştiye 55 sentên Amerîkî ku wekhevî 8 hezar lîreyên Sûrî ye, ajokar xwepêşandanan dikin. Ev bihayê bilind yê banzînê bare ajokaran duqat girantir kiriye û dibe ku bibe sedema rawestandina karê wan. Bi taybet di vê rewşa aborî a zehmet de, wê çawa karibin pêdiviyê malbatên xwe dabîn bikin."



Necmedîn Osman

Necmedîn Osmen axaftina xse wiha qedand: "Em jî dixwazin xizmeta gelê xwe bikin û kiriya veguhestinê bilind nebe, lê derfet û buhayê bilind yê banzînê rewşa ajokaran xerab dike. Xwendekar û karker hene ku rojane bi hewcetê erebeyên veguhestina hundirîn in. Ger buhayê benzînê bilind bimîne, kes qebûl nake ku bi van buhayên heyî bixebite an jî li erebeyan siwar bibe. Ajokar beşek ji civakê ne, tiştê ku zirarê dide welatiyan di heman demê de zirarê dide ajokaran jî. Herwiha dema wergirtina sotemeniyê jî hertim tê guhertin û sabît namîne. Berê her heftiyetê carekê her erebeyekê para xwe ya sotemeniyê werdigirtin, lê niha ev yek jî hatiye guhertin û ji ber derengmayînê ajokar ziyanê dibînin."



Xalid Icac

### 'Buhaya sotemeniyê karê me asteng dike'

Ajokarê bi navê Xalid Icac destnîşan kir ku ew dixwazin dengê ajokar û gel bigihêje aliyên pêwndîdar û wiha domand: "Sotemeniya ku didin me têra me neke ji ber vê jî em neçar dimînin ku sotemeniyê ji bazara azad bi bihayên bilind bikirin. Buhaya sotdemeniyê karê me zehmet dike, di heman demê de karê me radiwestî ne. Ji ber buhayê zêde yê sotemeniyê, em mecbûr dîmînin ku kirya erebeyên xetan jî zêde bikin, ev yek jî zerarê dighîne me û dighîne gel jî. Buhabûna sotemeniyê rasterast bandore li her tiştî dike. Sotemeniya ku ji bo ajokaran tê dayîn, tenê 75 lître ye di hefteyê de û ev yek têra me neke. Daxwaza me ji kesên têkildar e ku buhayê sotemeniyê vegerînin weke berê, yan jî qaseya sotemeniya taybet ji bo ojokaran zêde bikin."



Ebdulqadir Neyo

### 'Em bê elektirîk û sotemeniyê mane'

Welatiyê bi navê Ebdulqadir Neyo da xuyakirin ku ji ber buhabûnê ew nikarin debara xwe ya jiyanê bikin û wiha pê de çû: "Em bê elektirîk û sotemenî mane, em niha di demsala havînê de ne germahî gelek zêde ye, ji ber nebûna elektirîkê em di nava germaniyê de dimînin û ji ber vê yekê jî zarokên me nexwaş ketine. Herwiha buhaya hemû pêdiviyên jiyanê zêde bûye, em ji ber buhabûnê nikarin pêdiviyên esasî yê ku pêwîste di her malekê de hebe bikirin. Buhabûn di her milî de çêbûye, em nikarin daxwazên zarokên xwe ji ber buhayê pêkbînin. Em bang kesên têkildar dikin, ku xwedî li vî gelî derkevin, rewşa jiyanî ya vî gelî di ber çavan re derbas bikin. Herwiha ji bo elektirîkê pêwîste kesên têkildarî wê mijarê bi lez tevbigerin."